Pêşî, divê mirov bibêje ku di gel ku bûye sala sêyem ya erdhejê, li bajarî hilweşîn didomin. Ji ber vê yekê li bajarî problemên gemara hewayê, gihîştina ava paqij hîn jî di asteka bilind da nehatine çareserkirin. Ji pirsên ku ji zarokan hatine kirin em fam dikin ku zarokan trawmaya erdhejê derbas nekirine, ji ber erdhejê biçûk yê bi dû ra pirsgrêkên wan yê xew, xwarin û peydakirina stargehekê (li mala xizman, di konteynirên nava taxê yan jî bajarên konteyniran da dimînin) hîn didomin û loma bandorên wê yê sosyal û psîkolojîk didomin.

Gava zarokan li cem dêûbavan bersiv didan pirsên ankêtê, bi dizî be jî li wan dinêrin û çavê wan li erêkirinê digerîya. Tirsê wan ya erdhejê didome. Dibêjin ku mana li nava malbatên qelebalix, li malên du qatî, li malê nêzî zemîn û rê ewletir e.

Haîye dîtin ku zarok -nexasim yê nû dest bi dibistanê kirine- di vê pêvajoyê da bêhtir bi dêûbavên xwe hatine girêdan, lêbelê ew tirs bi wan ra heye ku di erdhejê da ew dê bi wan ve negihîjin.

Wekî cihê ewle bêhitr kuçe û hewş nîşan dane lê gotine ku ji ber ku park tune ne ew li kuçe û hewian dilîzin. Divê mirov derxîne pêş ku piştî erdhejê ji bo zarokan têra xwe qadên lîstikê yê ewle tune ne.

Bi piranî bi diltirsî beşdarî xebatê bûn.

Piranîya pirsan ji bo zarokên biçûk zehmet bûn. Ji ber ku nexasim xerîbê têgehên mîna mafê lênêrîna dêûbavan, mafê parastina li dijî îstismarê, mafê lênêrîna di rewşa seqetîyê da bûn; loma pirs bi giştî bi mînakan hatin ravekirin û xebat hat temamkirin.

Di xebata Xetayê da, di gel ku bi giştî ereb in û zimanê li malê tê axiftin -nexasim di mezinan da- erebî ye, têgihiştina wan wisa ye ku zimanê wan yê dayikê tirkî ye. Di hin hevdiştinan da mezinan ragihandîye ku ew berê zarokan nadin erebî da ku tirkî baştir hîn bibin.

Haîye çavdêrîkin ku, zarok koçê wekî ji ber erdhejê çûn û vegera derveyê bajarî ya ji bo demekê fam dikin, û baş fam nakin ku li cihê lê dijîn cudakarî tê çî manayê.

DÎLOK

Haîye raçavkirin ku zarokên di ser 15 salî ra di derbarê dahatîyê da ne xwedîyê hêvîyekê ne. Bi fikarin ku ew dê bi vî awayî jîyana xwe çawa îdame bikin. Dibêjin ku ew gelekî ji erdhejê ditirsin lê xuya ye ku hinekî hînî rewşê bûne. Haîye raçavkirin ku zarokên heta 11-12 salî ji trawmayê xelasa nebûne û bi diltirsî dijîn. Nexasim zarokên 7-8 salî wisa tevdişgerin ku erdhej dê dîsa pêk were û di dengê herî biçûk da vediciniqin.

Zarokên di ser 15 salî ra hinekî din gihîştî tevdigerin. Niha natirsin lê difikirin ku şertên jîyanê gelekî zehmet in û ew dê li vî welatî çî bikin. Bi diltirsî li jîyana xwe difikirin. Tiştê jê ditirsin ne erdhej e lê encamên wekî tenêbûn û her wekî din yê piştî erdhejê ne. Hatîye raçavkirin ku di hemûyan da tirsê felaketekê din û encamên wê hene.

Zarokên 7-8 salî hîn jî gelekî bidiltirs in. Herçiqas wekî zarokên 15 salî nafikirin, gelekî ditirsin. Xuya ye ku ditirsin ku tiştek were serê cîranên wan, hezkirên wan, hevalên wan, malbat, xwişk û birayên wan. Bi tenê nikarin razin û her dixwazin bi dêûbavên xwe ra razin. Ji ber ku hevdîtî bi dêûbavan ra hatî kirin, ev çavdêrî hatî kirin.

Zarokên di ser 15 salî ra difikirin ku xwendina dibistanê bêmane ye. Difikirin ku gelekî zehmet e ku ew bibin xwedî pîşe. Ev rewş nexasim di kurikan da dixuye. Kurik dixwazin di tamîra cereyanê da bixebitin. Hem ji ber şertên jîyanê hem ji bo alîkarîya malbatê vî tiştî dixwazin. Zarokên ku temenên wan biçûktir in jî, di derbarê dahatîyê da bêhêvî ne. Difikirin ku perwerdehî bîlasebeb e. Lewra difikirin ku bi felaketekê her tiştî wan dê birûxe.

Di derbarê mafên zarokan da bi piranî ne xwedî agahî ne lê gelek zarok hene ku haya me ji wan mafan heye. Bi mamosteyan ra jî hevdîtînin pêk hatin. Hatîye çavdêrîkirin ku li dibistanan jî, di vî warî da çalakî û pêşkêşî çêbûne. Nexasim zarokên di ser 15 salî ra, di vî warî da xwedî agahî ne lê ji ber zehmetîyên ku jîyane difikirin ku tu mafên wan têra xwe dabîn nabin. Aşkera bûye ku zehmetî di vegotina zarokan ya xalên gihîştî û têrkirîna da peyda bûne. Hatîye raçavkirin ku ji bo wan mana di konteynirê da ji bo gihîştîna mafê stargehê bes e.

BEŞA VI. NÊRÎN Û PÊŞNÎYAZ

Destpêk

2 sal di ser wan erdhejan ra debas bû ku 6ê sibata 2023yan qewimîn, navenda wan Meraş bû û bandoreka mezin li Xetay, Edene, Semsûr, Amed, Xarpêt, Dîlok, Meraş, Kilîs, Meletî, Osmanîye û Rihayê kir. Ji wê hingê ve li her bajarî bandorên mekanî, civakî, psîkolojîk û aborî yên erdhejê di astên cuda da li ser zarokan çêbûn. Hewldana dermankirina hilweşîn û trawmaya bi erdhejê ra hat, baş bûn, domandina jîyanê ya bi tenduristî û ewlehî li her wîlayetê cuda be jî; ji çavdêrî û lêkolînan dîyar dibe ku li herêmên erdhejê pêdivîyeka mezin heye.

Yek ji mijarên herî binîqas ew e ku halê zarokan yê başî û ewlehîyê heta ku derê dabîn dibe; di van du salan da zarokan trawma û şertên erdhejê di çî astê da derbas kirine yan jî ji bo ku derbas bibe dikarin xwe bigihînin kîjan derfetan. Çavdêrî nîşan didin ku çalakî û hewldanên ku dixwazin zarokan ji bandorên erdhejê biparêzin; wan jê hêla sosyal, hestî û psîkolojîk biparêzin, gelekî kêmtir in. Tirkîye, li gor xala 4. ya Peymana Mafên Zarokan ya Neteweyên Yekbûyî, divê di nava şert û mercên zehmet da, ji bo zarokan hemû tedbîrên hiqûqî, îdarî û yên din bigire. Di mijara mafên aborî, civakî û çandî da pêwîst e ku dewlet çavkanîyên xwe yên heyî bi awayê herî berfireh bi kar bîne û eger pêwîstî pê hebe di çarçoveya hevkarîya navneteweyî de tedbîran bigire. Lê tecribeya du salan, baş da famkirin ku rêzîknameyeka qanûnî ya taybet ji bo parastina zarokan ya di karesatên xwezayî da û astengkirina bînpêkirina mafên zarokan kêmanîyeka mezin e.

Di du salên dawî da, daneyên bihûrgilî yê di derbarê gihîştina mafên bingehîn û îhlalên ku qewimîne da, kê in. Ji bo dagirtina vê valahîyê Komeleya Berî Her Tiştî Zarok li 5 bajarên ku bandora erhejê herî zêde li wan xuya bûne, bi zarokan ra rûbirû hevdiştin pêk anîne. Di vê çarçoveya da, lêkolîna meydanî li Xetay, Dîlok, Meletî, Meraş û Semsûrê bi 525 zarokan ra rûbirû pêk hat ku temenên wan di navbera 7-18an da bûn. Lêkolînê hewl daye bipîve ku piştî du salan zarok bandorên erdhejê çawa dijin, çiqasî heq ji bandaorên erdhejê derketine, haya wan ji mafên wan heye yan na, tesbît bike ku derfetên wan yê sîdwergirtina ji mafan çî ne û dîyar bike ku pêdivî, daxwaz û meylên zarokên li bajarên erdhejê çî ne. Ev rapor, li ser daneyên vê xebata meydanî analîzeka kûr dike.

Di analîzê da em dê ne bi tenê li ser hejmaran bisekinin lê sedem û encamên daneyan şiroveyan bikin, pêwendîyê di navbera zanyariyên cuda da bikin. Bo nimûne em dê rejêyen bandaora psîkolojîk û asta standina destekê bidin ber hev, pêwendîyê di navbera karkerîya zarokan û rîskên qutbûna ji perwerdehîyê da deynin. Çavdêriyên çawanî û agahîyên çendanî bikin yek û hewl bidin fam bikin ku derbirîn û tevgerên zaorkan li ser kîjan paşxaneyê ava bûne. Hemû nirxandin dê di çarçoveya Peymana Mafên Zarokan da, bi dîtineka li ser esasê mafan bîn kirin; mafên ku îhlal bûne û yê di xetereyê da ne yê li herêma erdhejê dê bîn dîyarkirin.

Kurteya Metodolojîyê

Lêkolîn bi rêbaza anketa çendanî pêk hatîye. Nimûne, ji pênc wîlayetan (Xetay, Dîlok, Meletî, Meraş, Semsûr) ji 525 zarokan pêk tê. Hevdiştin bi zarokên 7-18 salî ra rûbirû pêk hatine. Hem di asta wîlayetê da hem ji komên zayend û temen cuda daneyên berfireh hatine berhevkirin. Forma pirsan ya xebatê ji 5 beşan pêk tê.

- **Beşa 1. (Demografi):** Agahîyên wekî zayend, temen, asta perwerdehîyê dihundirîne.
- **Beşa 2. (Bandora Erdhejê û Pêdivîyên Bingehîn):** Wan pirsan dihundirîne ku erdhejê çi bandor li zarokî kirine, rewşa stargeh, xwarin, vexwarin û kincan çi ye û zarok xwe digihîjîne wan yan na.
- **Beşa 3. (Cudakarî û Lêhaybûna Mafan):** Armanc dike ku cudakarî û îhlalên ku zarok lê rast hatine û asta lêhaybûna wan ya mafên wan fam bike. Tecrîbeyên zarokên koçber û penaber jî di vê beşê da hatine nîrxandin.
- **Beşa 4. (Gihîştin û Bikaranîna Mafan):** Li wan pirsan hûr dibe ku hewl didin gihîştina zarokan ya mafên perwerdehî, tenduristî, lîstin û beşdarîyê fam bikin û pêk anîn û pratîkkirina wan mafan dîyar bikin.
- **Beşa 5. (Çavdêriyên Çawanî):** Têbînîyên çavdêriyên anketoran dihundirîne; tevgerên balkêş, bertekên hestî û şertên fîzîkî yên hevdiştinê radigihîne.

Di analîzê da, bersivên zarokan bi zayend, temen û asta perwerdehîyê ra hatine berawirdkirin. Bi vî şeklî bandorên wan yên li ser bersivan hatine dîyarkirin. Wekî mînak, xuya dibe ku di navbera bersivên keçik û kurikan da û yên temenbiçûk û temenmezin da cudahîyên aşkera hene. Herweha xuya bûye ku zarokên koçber û penaber naxwazin ku bersiva pirsên di derbarê cudakarîyê da bidin. Ev rewş nîşan dide ku zarok di mijarên hesas da bi diltirsî tevdigerin. Loma, di şirovekirina encaman da hesabê vî tiştî jî hatîye kirin.

Xebata meydanî di nîsana 2025an da bi dawî bûye û dane bi vê raporê hatine analîzkirin. Agahîyên çendanî bi grafîk û tabloyan; çavdêrîyan çawanî, ji bo ku ev agahî baştir bîn famkirin entegreyî beşên guncaw bûne. Li jêr agahîyên bingeîn û analîzên xebatê bi sernavên cihê hatine rêzkirin.

Profîla Nimûneyê: 525 zarok beşdarî xebatê bûne û ji her bajarî nêzî ji pênc paran parek zarok hene. %22,7 ji Dîlokê, %19,6 ji Semsûrê, %19,4 ji Meletîyê, %19,4 ji Xetayê û %18,9 ji Meraşê ne. Bi vî awayî di derbarê rewşa zarokan ya 5 wîlayetan da tabloyeka bi hevsengî bi dest ketîye. %56an keçik, %44an kurik in. Ev rêje destûrê dide têgihîştina tecirbeya keçikan. Gava mirov li temenan dinêre, xuya dibe ku piranîya beşdaran ji zarokên temenmezin pêk tên. %56,6 15-18 salî, %26,3 11-14 salî, %17,1 7-10 salî ne. Yanî, zarokên kamil dibin di xebatê da cihekê mezintir digirin. Ev yek ji bo têgihîştina pirsgerêkên zarokên kamil dibin, giring e; lê divê neyê jibîrkirin ku zarokên temenbiçûk jî tên temsîlkirin.

Asta Perwerdehîyê: Gava li rewşa perwerdehîyê dinêrin em dibînin ku %17,2yê wan xwendekarê dibistana seretayî, %26,1 xwendekarê dibistana navîn û %56,7' xwendekar yan jî mezûnên lîseyê ne. Ji ber ku piranîya beşdaran di temenê kamilbûnê da ne, ev encama xwezayî derdikeve holê. Wekî nîşaneka giring, %95,8ê zarokan ji bo pirsê "Hûn perwerdehîyê didomînin?" gotine erê. Yanî piştî erhejê jî ji her 10 zarokî 9,5an dibistana xwe domandîye. Bi tenê %4,2yê wan gotine em nadomînin. Ev tê wê maneyê ku bi rêjeyeka mezin li dibistanê vegeîyane. Ev rêje ji texmînan zêdetir e û nîşan dide ku li herêmê fealîyetên perwerdehîyê dewam dikin. Lê divê mirov li wan %4,2yan hûr bibe. Ev tê maneya ji 525 zarokan 22 zarok, ku ev hejmar tê wê maneyê ku hejmareka zarokan ji perwerdehîyê qut bûne zêde ye.

Daneyeka din ya li ser dewama perwerdehîyê bi malbatan ra pêwendîdar e. %9ê zarokan ji bo pirsar “Di malbata we da xwendekarên ku dibistan nedomandine hene?” gotine erê. Yanî li gor her ji 10 zarokan zarokekî, yek ji malîyên wan dibistan nedomandîye. Cihê dilxweşîyê ye ku zarok dibistanê didomînin, lê ji ber ku %9ê zaroka gotîye erê, em dikarin bibêjin ku di hin malbatan da zêdeyî kesekî ji ber sedemînan dev ji dibistanê bedane.

Paşxaneyar Koçber-Penaberan: Yek ji pirsên beşar demografîk di derbarê tecribeyar koçar malbatan da ye. %90,1ê zarokan ji bo pirsar “Malbata we berê mecbûr maye ku koç bike?” gotine na. Bi tenê %6,1ê wan gotine erê. (Rêjeyekar biçûk yar mayî nexwestîye ku bersivê bide.) Gava mirov li vê rêjeyar nêzî ji sedî şeşan dinêre, dibîne ku beşekar wan yar giring ji Sûrî hatine (%21,9 ji Sûrîyê hatine). %21,9ê zarokan nexwestine ku bersivê bidin. Ev dane nîşan dide ku di nava beşdaran da, biçûk be jî, komekar zarokan yar penaber/koçber heye. Ev malbat bi îhtimalekar mezin ji ber krîzar Sûrîyê hatine. Rewşar van zarokan, ji ber tecribeyar şer û yar erdhejê dikare diwartir be. Yar soxîn, dîyar bûye ku zarokên penaber nexwestine bersivar hin pirsan bidin. Ev rewş di agahîyên demografîk da jî xwe nîşan dide; wekî mînak pîranîyar zarokên penaber nexwestine bersivê bidin pirsar cudakarîyê (Em dê bi hûrgilî li ser vê meseleyê bisekinin).

Bi kurtî profîlar demografîk yar xebatê wîlayet, temen, zayend û astar perwerdehîyê beşdarên lêkolînê dihundirîne. Ev çeşîddarî, derfetê dide ku em agahîyan bi giştî qebûl bikin. Analîzar demografîk, nîşan dide ku pîranîyar zarokan dibistan domandine lê hinekan nedomandine; hejmara zarokên penaber kêmar in lê hene; û hevsengîyar zayend û temen divê di analîzan da li ber çavan bîn girtin; ev profîlar bingeîn, di dewama raporê da, dê paşxaneyar analîzar pêdivî, îhlalên mafan û rewşar psîkososyal pêk bîne ku em dê pêşkêş bikin

Analîza Pêdivîyên Bingehîn û Stargehê:

Erdhejê mal û stargehên bi hezaran malbat bi tûmî guhert û nehişt ku zarok xwe bigihîjînin pêdivîyên herî bingehîn. Daneyên xebatê nîşan didin ku zarokên li herêmên erdhejê di warê stargeh û pêdivîyên bingehîn yê heyaî da çiqasî hesas in.

Rewşa Stargehan: Bersivên ji bo pirsê “Hûn niha li ku derê dimînin/disitirin?” şertên strînê nîşan didin. Nêzîkî nîvê zarokan (%52,2) gotin em li mala xwe dimînin (mala ku milkê malbatê ye yan jî ji berê da lê diman). Lê beşeka giring, hîn li stargehên demborî dimînin: %33,7ê zarokan got em di konteynirê da dijîn. %9,9ê wan li mala bikirê dimînin, %2,1ê wan di xaniyekê demborî da dimînin, %1,3ê wan li malên prefabrîk dimînin. Rêjeya zarokên ku di konan da dimînin %0,6 e, ango kêmtir e lê ne bi tûmî tune ye; herweha kesên ku li pansîyonan dimînin %0,2 ye û beşeka biçûk pêk tînin. Ev rêjeyên nîşan didin ku her ji du zarokan yek li mala xwe ya mayînde namîne û her ji sê zarokan yek li bajarên konteynirî dimîne. Di gel 2 sal di ser erhejê ra derbas bûye, ji sê paran parekê zarokan venegerîyaye maleka mayînde, em dikarin bibêjin ku mafê strînê (Mafê standardên jîyanê yê guncaw ku bi PMZ madeya 27an hatîye sazîkirin).

Di rewşa stargehan da, li gor temenan cudahiyan balkêş dixuyin. Beşeka mezin ya zarokên ku temenên wan biçûk in di konteyniran da dimînin: ji yê 7-10 salî %56,7, ji yê 11-14 salî %45,7 di konteyniran da dijîn. Lêbelê rêjeya mana di konteyniran da ya temenmezînan kêmtir e (li gor daneyan mirov dikare bibêje %30ê ji 15 salî mezintir di konteyniran da dijîn). Ev rewş, nîşana wî tiştî ye ku malbatên zarokên wan biçûk in bêhtir zehmetîyan dikişînin ku derbasî xaniyên nû bibin. Ev malbat yan jî ber îmkaniyên kêmtir yan jî ber rîskê di konteyniran da dimînin. Li gor çavdêriyên çawanî, li Xetayê hin malbat nêzî xizmetên xwe dimînin, li taxê di konteynirê da dimînin û bi ya wan ev rêya herî ewle ye. Li gor zarokan jî malên nêzî erdê ji yê du qatî “çêtir” in. Ev gotin nîşan didin ku dêûbav û zarok bi teredut dikin ku derbasî maleka mayînde bibin yan jî derfetên wan tune ne ku derbas bibin.

Gihîştina Pêdivîyên Bingehîn (Xwarin, Kinc hwd.): Ji ber ku piştî erdhejê çavkanîyên debarê yên malbatan û binesazîyê zîyaneka mezin dît pêdivîyên zarokan yên wekî xwarin, ava paqij û kincan jî ketin xetereyê. Di anketê da bi pirsê “Hûn bi rehetî digihîjin xwarin/xurek/kincên bingehîn?” ji zarokan hatîye xwastin ku ew rewşa xwe binirxînin. %86,2yê wan gotîye erê, %8,4ê wan gotîye na, %5,4ê wan gotîye qismen. Yanî ji her 10 zarokî nêzî yekî gotîye ez nagihîjim pêdivîyên bingehîn, yekî jî gotîye qismen digihîjim. Ev rêje biçûk be jî, aşkera dike ku li herêmê bi hezaran zarok nikarin bigihîjin pêdivîyên bingehîn. Çavdêriyên anketorên Semsûrê jî radigihînin ku alîkarîyên destpêka erdhejê dewam nekirine û gelek mirovên mihtac hene. Zarokan jî gotîye malbata wan hewl dide ku pêdivîyên xwe bi destên xwe peyda bikin. Ev tişt olana rêjeya %8,4an e ku dibêje “na, ez nagihîjim pêdivîyên bingehîn”. Axlebê malbatên zarokên ku gotine em qet nagihîjin, ew malbat in ku birêkûpêk alîkarîyê nastînin û di warê aborî da di rewşeka xerab da ne.

Di warê gihîştina pêdivîyên bingehîn da di navbera temenan da hin cudahî hene. %12,2yê zarokên 7-10 salî gotîye “na ez nikarim”, ji bo yên ji 15 salî mezintir ev hejmar dadikeve %5,8an. Bi heman awayî rêjeya zarokên temenbiçûk yên ku dibêjin “erê ez dikarim” %84,4 e û di yên ji 15 salî mezintir da %88,8 e. Ev cudahî dibe ku ji ber wê yekê be ku zarokên biçûk bêhtir merûzî pirsgirêka debarê ya malbatan dimînin yan jî di dabînkirina pêdivîyên zarokên biçûk da (şîr, mama, kincên zarokan hwd.) zehmetî derdikevin. Bi alternatîfî, dibe ku meyla gazinên zarokên kamil yên ji pêdivîyên bingehîn kêmtir be; lewra dibe ku yên kamil dibe ku rewşê qebûl dikin û rewşê baş nîşan didin. Tê zanîn ku axlebe kurikên kamil di warê derbirîna pirsgirêkên fîzîkî û hestî da dikarin ketûmtir bin; axirê, her wekî em dê piştra li ser bisekinin, di bandorên psîkolojîk da jî ferqa zayendê derdikeve pêşîya me. Dîsa jî, em bi rasteqînî lê binerin dibe ku hejmara kesên ku dikarin dahatê ji malbatê ra bînin ya malbatên bi zarokên biçûk kêmtir bin û zarokên biçûk derfeta xebatê nehiştibe. Di encamê da, mirov dikare bibêje ku, rîska tunebûnê ya malbatên bi zarokên biçûk, zêdetir e.

Gihîştina Xizmetên Tenduristîyê: Piştî erdhejê ji ber ku nexweşxane xera bûn, binesazî têk çû xizmetên tenduristîyê asteng bûn. Piştî du salan, rewşa gihîştina dezgehên tenduristîya bingehîn ji zarokan hatîye pirsîn. Ji bo pirsê “Nêzî cihê ku hûn dijîn dezgehên mîna navenda tenduristîya malbatê yan jî nexweşxaneyan hene?” ji %91,5ê zarokan gotîye erê. %7,1ê zarokan gotîye tune ye, %1,3yê wan jî gotîye nizanîm. Piraîya wan gotîye ku nêzî wan dezgehên wisa hene, bi mirov dide fikirîn ku binesazî di asteka bilind da hatîye serrastkirin. Lêbelê li vê derê besiva “erê heye” nayê manaya ku zarok wê xizmetê distînin. Nexasim li çolterê yan jî di rewşên ku bajarên konî û konteynirî dûrî navenda bajarî ne, bi awayekê teorîk navendeka tenduristîyê ya “nêz” hebe jî, ji ber faktorên mîna veguhastin, kapasîte û zimanî gihîştina xizmetê dikare were astengkirin. Dîsa jî, pirsgerêkeka krîtîk e ku %7ê zarokan bibêjin dezgeheka tenduristîyê tune ye: zarokên di vê rewşê da dê di nexweşî yan jî birîndarîyê da zehmetîyê bikişînin ku xwe bigihîjînin wan dezgehên. Ev rewşeka wisa ye ku dikare mafê tenduristîyê (PMZ made 24) îhlal bike. Divê mirov cih bide tiştekî ku anketorên Xetayê bilêv kirine: di gel ku sala 3. ya piştî erdhejê ye li bajarî gemara hewayê û pirsgerêkên xwegihîştina ava paqij di asteka bilind da nehatîye çareserkirin.

Ji ber toz û gemara ji hilweşandina avahîyan derdikeve, pirsgerêka ava vexwarinê ya paqij hîn jî ji bo tenduristîya zarokan xetere ye. Ango, herçiqas dezgehên tenduristîyê hebin jî, bêtê derdoreka paqij û ava paqij mirov nikare bibêje ku zarok ji mafên tenduristîyê sûdê werdigirin.

Hîjyen û Av: Di gel ku di anketan da bersiva “gihîştina ava paqij” tune ye, çavdêrîyên li Xetayê û rewşa giştî nîşan dide ku şertên hîjyen û ava paqij dûrî rewşeka îdeal e. Gemara hewayê û pirsgerêka avê, tê manaya zehmetîya dabînkirina pêdivîyên hîjyenê yê bingehîn. Ev jî axlebe ji ber nexweşîyên şewbî û tenduristîya giştî xetere ye. Peymana Mafên Zarokan ya NYyê dabînkirina ava paqij û hîjyenê wekî parçeyekê mafê tenduristîyê dibîne. Di vê çarçoveyê da, başkirina stargehan û şertên derdorê, ji bo parastina tenduristî û geşbûna zarokan hewceyîyeka acil e.

Stargehên Ewle û Jîngeh: Strîn hem pêdivîyeka fîzîkî ye hem bi hesta ewlehîyê ra eleqedar e. Di analîza li ser bingeha mafan da, nîşaneyeka giring e ku zarok xwe li cihekê ewle his dikin yan na. Di beşên pêş da em dê bi hûrgilî li ser bisekinin lê li vê derê em dikarin cih bidin vê daneyê: Ji bo pîrsa “Gava hûn li jîngeha xwe dilîzin, hûn ewle his dikin?” %61,8ê zarokan gotîye erê. Yanî, nêzî %38ê zarokan gava dilîzin difikirin ku ne di ewlehîyê da ne. Yê ku li kuçeyê xwe di ewlehîyê da his dikin kêmtir in (%38,7an gotîye erê). Lêbelê ji bo pîrsa “Hûn di nava malbatê da xwe di ewlehîyê da his dikin?” %93,5an gotîye erê. Ev cihêtiya mezin, nîşan dide ku zarok li derveyê stargehên xwe (kuçe, qadên lîstîkê) xwe di ewlehîyê da his nakin. Zorokên xwedîyê tecribeya erdhejê, maleka wan ya tekûz hebe jî, erdhejê hîn wekî xetereyê dikarin bibînin; avahîyên hilweşîayayî, qadên lîstîkê yê ne ewle vê hisê xurttir dikin. Li Meraşê anketoran ragihandîye ku endîşeya mezintirîn ya zarok û dêûbavan ewlehî ye. Di vê kontekstê da zarokên derbasî maleka saxlem bûne jî ji ber erdhejên biçûk û tîrsa erdhejên nû dîtirsî ne. Axirê, ji bo zarokan mafê stargehekê, ne bi tenê çar dîwar in; divê cihê ku lê disitirin wan ji hêla psîkolojîk jî ewle bide hiskirin.

Nirxandin: Li gor Peymana Mafên Zarokan madeya 27an mafê zarokan heye ku bikare geşedana xwe ya laşî, hişî, ruhî, exlaqî û sosyal pêk bîne. Dîyar e ku li herêma erdhejê ev maf tam bi cih nehatîye. Mafê strînê ji bo gelek zarokan tê manaya kon û konteyniran; Zarokin hene ku di mafên ava paqij û xwarinê da tengasîyê dikişînin. Wezîfeya dewletê ew e ku di afetan da jî hemû pêdivîyên bingeheke yê zarokan dabîn bike (PMZ made 4). Xuya ye ku pêwîst e dezgehên eleqedar û civaka sîvîl ji bo stargehên mayînde, xwarin û ava paqij û desteka pereyan gavên bibandor biavêjin. Di beşa “pêşnîyazan” ya vê raporê da, mafê zarokan yê gihîştina stargehên ewle, hişyên, xwarina tendurist û ava paqij derketîye pêş.

Di encamê da, herçiqas li herêma erdhejê beşeka giring ya zarokan digihîjin pêdivîyên bingeheke yê heyatî, beşek ji wan jî di warê mayîndebûn û berdewamîya stargeh û pêdivîyan da pirs-girêkan dijîn.

Ev rewş bandorê li qadên mafan yê dîtir jî dike (wekî mînak zarokên ku baş naxwin dikarin di perwerdehiyê da arîşeyan bijîn, ne ewle be nikarin bilîzin hwd.) û di van qadan da çareserîyên bi lezgînî pêwîst in.

Analîza Bandorên Psîkosoyal ve Mekanîzmayên Piştirgirîyê

Yek ji bandorên giring yê erdhejê psîkosoyal in. Zarok gava bûyereka trawmatîk dijîn, dikarin guherînên giring yê rewşa hestî, tenduristîya ruhî û tevgerên civakî pêk werin. Encamên anketan dîyar dikin ku erdhejê ji hêla psîkolojîk ve bandor li piranîya zarokan kirîye. Di gel vê bandora mezin, piştirgirîyên psîkolojîk gelekî kêr hatîye dabînkirin. Li jêr, asta bandorgirtinê, semptomên xuya dibin û piştirgirîyên hatine standin bi hev ra hatine nirxandin.

Asta Bandora Hestî ye Erdhejê: Bersivên zarokan yê ji bo pirsê “Erdhejê ji hêla hestî/psîkolojîk ve bandor li we kir?”, berbelavîya trawmayê bi hejmarî nîşan didin. %46,3yên zarokan gotîye “erê pir bandor kir”, %24,3yên wan gotîye “bandor kir”. Yanî bi yekûnî bandoreka mezin %71,6ên wan bûye. %16,43ên wan gotîye “bandoreka kêr kir”, bi tenê %11,2yên wan gotîye “qet bandor nekir”. Ev dane gelekî muhîm in. Ji her deh zarokan 7an gotîye ku kêşeyên psîkolojîk yê giran yan jî nîv-giran jîyane; bi tenê yek jê îdîa kirîye ku qet bandor lê nebûye. Ji bo erdhejê hilweşîner ev rêje ji rêzê xuya dibin lê divê mirov li ser vî tiştî bisekine: Profîla kesên ku gotine “qet bandor nekir”. Dibe ku îhtimala ku qet bandor li wan nebûbe, kêr be; mihtemelen hin ji wan di gel bandoran nexwastine ku vê yekê bi lêv bikin. Anketoran ragihandîye ku hin zarok bandora erdhejê înkâr dikin yan jî hewl didin ku kêr nîşan bidin. Di têbînîyên çavdêriyan yê giştî da, xuya dibe ku hin ciwanan gotîye ku em ji erdhejê natirsîn û bandor li me nekirîye; lêbelê di zarokên biçûk da tirs û endîşe bilind e. Ango, hin zarokên kamil, belkî ji bo ku xurt xuya bibin ya jî trawmayê bişînin derhişê xwe, gotine ku “ez qet netirsîyam”. Li vê derê faktora zayendê balê dikişîne.

Cudahîya Zayendê: Di beyana bandora psîkojîk ya kurik û keçikan da cudahîyeka berçav heye. %52,4ên keçikan gotîye ku “gelek bandor kir”, %38,5ê kurikan ev tişt gotîye. Bi heman awayî, rêjeya kurikên ko gotine “qet bandor nekir %15,6 e, ya keçikan %7,8 e. Ev dane, nîşan dide ku keçik di warê derbirîna bandora erdhejê da bêhtir rastgo ne yan jî bi rastî bêhtir bandor kirîye. Dibe ku meyla kurikan hebe ku bandora erdhejê kêmtir nîşan bidin; rêjeya kesên ku gotine “bandoreka kêmtir kir” di kurikan da (%21,6) li gor keçikan (%12,2) zêdetir e. Mimkin e ku kurik ji ber normên zayenda civakî, naxwazin hestên xwe yê wekî xemgînî û tirsê nîşan bidin. Çavdêrîyên çawanî jî vî tiştî destek dikan. Anketoerên Dîlokê gotine ku, kurikên ji 15 salî mezintir zêde behsa tirsê erdhejê nekirine lê li şûna wê qala dijwarîya şertên jîyanê û endîşeyên dahatîyê kirine. Heta zarokên ji 15 salî mezintir (bi taybetî kurik) gotine “xwendin bêmane ye”, behsa zehmetîya peyda kirina meslekan kirine û gotine li derveyê dibistanê ew dixwazin karekî bibînin. Ev helwest, olaneka cuda ya trawmaya hestî ye: li şûna ku tirsê qebûl bikin hewl didin ku xurt bin û dest bi xebatê bikin. Li alîyê din keçikan reaksiyonên xwe yê hestî (tirs, girî hwd) bêhtir nîşan dane lê herweha rêjeya wan ya domandina dibistanê bilindtir derketîye. (%7,8ê keçikan gotîye qet bandor nekirîye, %15,6ê kurikan heman bersiv dane; ev tîne bîr mirov ku kurik bandora hestî red dikan)

Semptomên Psîkolojîk: Pirsê “Bandor kiribe bandoreka çawa li we kir?” ji wan zarokan hatîye kirin ku gotine erdehejê bandor li me kirîye. Li vê derê hin gotin pêşkêşî zarokan bûne û xwastine ku ew bibêjin erê yan jî na. Daneyên ber destên me, nîşan didin ku gelek tezahurên trawmaya erdhejê hene:

- **Tirs:** %89,6ê zarokan ji bo îfadeya “ez tirsîyam” gotîye Erê. Yanî hema bibêjin temamê zarokan ji erdhejê tirsîyane. Ev tirs dikare di derheqê kêlîya erdhejê da yan jî piştî wê be; di derbarê hilweşîna mala wan, erdhejên biçûk yan jî tirsê mirina hezîrên wan da be.

- **Endîşe:** Ji bo îfadeya “ez bi endîşe bûm” %77,8an gotîye erê. Endîşe (anksîyete), ji tirsê hinekî cuda ye û dikare wekî diltirsîyeka bênavber û hisa nepen ya di derbarê dahatîyê da bê şirovekirin. Bilindbûna vê rêjeyê, nîşan dide ku erdhejê endîşeyeka mayinde daye zarokan.

- **Hisa Neewlehîyê:** Ji bo îfadeyeka wekî “Ez êdî xwe neewle his dikim”, %63,9an gotîye Erê. Ji sê paran du parên zarokan dibêjin ku ew êdî li hember derdor û jîyana xwe neewle his dikin. Di trawmaya felaketeka wekî erdhejê da hisa ewlehîyê ya zarok ya li hember dinyayê hildiweşe.

- **Bêdengî:** Yê ku dibêjin “ez bêdeng bûm” %48 in. Ango nêzîkî nîvê zarokan in. Yanî, nêzîkî nîvê zarokan piştî erdhejê bêdeng bûne, hestên xwe parve nekirine, bi hevalên xwe ra kêmtir pêwendî danîne.

- **Berteka ji bo dengên ji nîşkê ve û bilind:** Ev bertek pir berbelav e; %65,7ê zarokan li hember dengên wisa vediciniqin/bertekê didin. Ev nîşaneyek trawmayê ye; dengê kêlîya ku erdhejê çêbû yê wekî hejî û qîrînê di zarokan da cih digirin; û gava dengekê nêzîkî wê dibihîsin wekî ku ji nû ve tecrîbe bikin, vediciniqin.

- **Xeydokî:** %50,1ê zarokan gotîye ku “ez bûm xeydokî” (dîlê min ji her tiştî dimîne, hesasîyeta hestî), %49,9an gotîye nebûm. Ev tê wê manayê ku erdhejê di hin zarokan da hesasîyeta hisî zêde kirîye.

- **Girîyê Bêsedem:** Ji bo îfadeya “Krîzên girî yê bisebeb û bêsêbeb” %48,6ê zarokan gotîye Erê. Yanî nîvê zarokan gotîye ku carinan sedem tune be jî ez digirîm. Ev nîşaneyeka berbelav ya piştî trawmayê ye.

- **Hêrsokî/Êrîşkarî:** Yê dibêjin “Ez bêhtir hêrsokî bûm, meyla şidetê bi min ra çêbû” %44,3 ye. Xuya ye ku her ji du zarokan yek ji nîşkê ve hêrs dibe û tevgerên agresîf nîşan dide. Ev rewş piştî trawmayê nexasim di zarokên kamil da dixuye. Hisa neheqî û zîyanê, bi hêrsê der dibe.

Mirov van daneyan bi hev ra binirxîne, dikare bibêje ku piştî erdhejê gelek nîşaneyên trawmayê di zarokan xuya dibin. Sê semptomên herî berbelav tirs, endîşe û neewlehî ye. Nêrînên anketo-
ran jî vî tiştî piştrast dikin: nexasim zarokên biçûk gelekî ditirsin û bi dengê herî biçûk vediciniqin. Zarokên 7-8 salî her wekî dê dîsa erdhej çêbibe tevdigerin, tena serê xwe ranakevin, her dixwaz-
in li cem dê û bavên xwe bin. Ev olaneka berbiçav ya tirs, endîşe û neewlehîya li jor hatîye behs-
kirin. Ji alîyê din ve, di kamilan da bandoreka psîkososyal ya cuda xuya bûye: hatîye raçavkirin
ku, herçiqas zarokên di ser 15 salî ra gotine em ji erdhejê natirsin; ji bo pêşeroja li vî welatî û
îdamekirina jîyana xwe, diltirs in. Yanî tirs a wan ji erdhejê bêhtir tenêti, nepenî û zehmetîyên
aborî yên piştî erdhejê ne. Ev jî olaneka din ya endîşeyê ye. Hin zarokên kamil, helwesteka gihîştî
nîşan didin lê di esilê xwe da endîşeyeka cidî ya dahatîyê di hewînin.

Piştgirîya Psîkososyal û Alîkarî: Mixabin piştgirîya psîkososyal ya ku gihîştîye zarokên ku van
nîşanên trawmatîk di hewînin, gelekî kêr e. Pirsêka giring ya anketê ev e: “We piştî erdhejê kîjan
piştgirî standin?”. Di vê pirsê da hin qelemên piştgirîyê hatine hejmartin û ji zarokan xwastine ku
bersivên “Erê/Na/Qismen” bidin. Di nava van qeleman da piştgirîya psîkolojîk jî heye. Dane
nîşan didin ku piştgirîya madî berbelav e, lê ya psîkolojîk hema bibêjin tune ye.

- **Piştgirîya Psîkolojîk:** %87,3yê zarokan gotîye ku wan piştgirîya psîkolojîk nestandîye, %2,1ê
wan gotîye Qismen (belkî hevdi tinek-du). Ango ji her 10 zarokan 9an piştgirîyeka profesyonel
nestandîye. Ev rêjeyeka pir kêr e ji hêla sernavê mafê “gihîştina xizmeta tenduristîyê” û
“rehabîlîtasyon”ê (made 39) kêmanîyeka cidî nîşan dide. Made 39 behsa “rehabîlîtasyona
zarokên ku li îstismar, kedxwarî, îşkence û bandorên şer rast hatine” dike lêbelê bi manaya xwe
ya fireh rehabîlîtasyona civakî û psîkolojîk ya trawmaya zarokên trawmatîk jî di vê çarçoveyê da
ye. Erdhej jî dikare di vê çarçoveyê da bê nixandî û wezîfeya dewletê û dezgehên piştgirîyê
ye ku piştgirîyê bide rehetbûna psîkolojîk ya zarokan. Lê dane nîşan didin ku ev wezîfe bi cih
nehatîye.

- **Piştgirîya Stargehê (kon/konteynir):** %78ê zarokan goîye ku me piştgirîya kon yan jî konteynirê stand. Ev tê wê manayê ku piştî erdhejê pêdivîya stirînê ya acîl bi rêjeyeka mezin hatîye dabînkirin. Rêjeya bilind ya kesên di konteyniran da dimînin, encama vî tiştî ye. %20,1ê goîye me piştgirîya stargehan nestandîye (mihtemelen yê li mala xwe yan jî merivekê xwe mane), %1,9ên wan goîye ku me qismen standîye. Erênî ye ku piştgirîya strînê wisa bilind e, lê mana li konteyniran ya dûdirêj pirsgirêkên cuda bi xwe ra tîne (kêmanîya mahremîyetê, pirsgirêkên hîjyenê, derdoreka qelebalix hwd). Çavdêrîya li bajarê konteyniran yê Semsûrê nîşan dide ku alîkarîya serdema pêşî dihat kirin bi demê ra kêmtir bûye û malbat her çûye bêhtir mihtac bûne. Yanî dabînkirina konteyniran pirsgirêkê bi dawî nake; ji ber ku jîyana konteyniran nikare her berdewam bike, stresa psîkososyal peyda dibe.

- **Piştgirîya Xwarinê/Kincan:** %61,9ê zarokan goîye ku me piştgirîya xwarin yan jî kincan standîye. %34,4ên wan goîya me nestandîye, %3,7ên wan goîye qismen. Ev nîşan dide ku mirov piştî erdhejê, pêşî li alîkarîya kinc û xwarinê hûr bûne. Dîsa jî her ji 3 zarokan 1ê alîkarî nestandîye; belkî ji ber ku pêdivîya wan jê çênebûye yan jî alîkarî negihîştîye her kesî. Nexasim li Semsûrê aşkera bûye ku ev piştgirî bi demê ra kêmtir bûne.

-**Piştgirîya Pereyan:** Rêjeya zarokên ku av piştgirî standine %27,1 e. Piranî (%69,8) pere nestandine, %3,1ên wan qismen standine. Piştgirîya pereyan, dibe ku kêmtir dezgehî û bêhtir bi destê DCS û hin bernamêyên dewletê be. Kêmanîya rêjeyê dibe ku ji ber alîkarî bêhtir bi malzemeyan bûye.

Piştgirîya Qada Lîstikê: Ji bo îfadeya “Piştgirîya cihê lîstikê” %14,2 gotîye “erê min stand”. Ev pir kêr e. %83,7ê zarokan gotîye min nestandîye, %2,1ê qismen. Qadên dostên zarokan, wekî parçeyekê piştgirîya psîkosoyal di gelek afetan da ava dibin. Lê li vê herêmê her ji 7 zarokan yekî piştgirîyeka wisa standîye. Çavdêrîyên anketoran jî dibêjin ku tunebûna qadên lîstikê ji bo zarokan pîrsgirêkeka mezin e. Li Semsûrê xuya bûye ku derfetên mîna sînema û şanoyê tune ne, zarok gelekî van çalakîyên dixwazin; hin çalakîyên ku çêdibin jî zû diqedin, dubara nabin û kêr dimînin. Zarokan eleqe nîşanî lîstik, resim û kargehên perwerdehîyê dane lê ji ber ku ew ne domdar in bêtetmînê xuya bûye. Ev tablo jî bilî %14,2yên ku gotine me piştgirîya qadên lîstikê standine, îşareta kêmanîya çalakîyên lîstik û kêfê ye. Mafê zarokan (PMZ made 31) dibêje ku ev ne bi tenê ji bo kêfê lê ji bo bidawîkirina trawmayê jî giring e. Loma, ev valahî divê wekî kêmanîyeka mafan ya giring bê qeydkirin.

- **Piştgirîya Perwerdehîyê:** %32,9ê zarokan gotîye min piştgirîya perwerdehîyê standîye. Li vê derê jî piştgirîya perwerdehîyê mebest, dibe ku alavên dibistanê, kursên telafîyê yan jî desteka kirtasîyeyê be. %64an gotîye min nestandîye û %3,1ê gotîya qismen. Di erdejê da dibistan wextekê hatin girtin, piştra ders li dibistanên konteynir yan jî bi bernameya xwendekarê mêvan yê li bajarên din pêk hatin. Gava mirov li vê rewşê dinêre, ev rêje dibe ku ne xerab bixuye. Lêbelê heta bi yê bînavber perwerdehî domandine jî dikarin pêdivîyê bi tablet, înternet, alavên dibistanê û destekên wekî din dîtibin. Di nav %64ên ku ev piştgirî nestandine mihtemelen yê ku têra xwe kirine jî hene, yê ku pêdivîya wan jê çêbûye û nestandine jî. Wekî din, di nava %32,9ê ku piştgirîya perwerdehîyê standine, belkî ew kes hebin ku ji ber erdhejê dibistan guhertine yan jî bernameya telafîyê standine. Ev mijar, bi beşa gihîştina perwerdehîyê ra jî pêwendîdar e. Lewra, %4,2yên zarokan gotibû wan dibistan nedomandîye. Îhtimal e ku ew zarok koma herî hesas e û herî zêde pêdivîya wan bi piştgirîya perwerdehîyê heye. Ev dane nîşan dide ku piştgirîya perwerdehîyê gihîştîyê hin zarokan lê têra wan nekirîye.

-Başîya Psîkososyal û Maf: Em tabloya jor bi tûmî şîrove bikin: Piştî erdhejê di mijara strîn û pêdivîyên madî yên bingeheîn da heta cihekî piştgirî hatîye dabînkirin (konteynir, xwarin); lê di warê pêdivîyên manewî û geşedanê da kêmanîyên mezin hene. Ev dane nîşan didin ku pêdivîyên psîkolojîk, madî û ekonomîk; bi piştgirîyên ku mafên lîstin û perwerdehîyê dihundirîne bi awayekê cidî nehatine dabînkirin. Piştgirîyên ku hatine pêşkêşkirin li başîya fîzîkî hûr bûne û “rewşa başî û ewlehîyê” heta cihekî hatîye hesibandin. Madeya 39. ya Peymana Mafên Zarokan, dibêje ku divê ji bo ku zarokên trawmatîk ji alîyê psîkolojîk û fîzîkî baş bibin, pêşgirî bînin standin. Lêbelê li vir başbûna psîkolojîk hatîye îhmalkirin. Wekî din jî mafê lîstîk û bêhnvedanê yê madeya 31. û mafê perwerdehîyê yê madeya 28. baş pêk nehatine.

Rewşa Psîkososyal di Çarçoveya Çavdêriyên Çawanî da: Çavdêriyên anketoran hejmaran erê dîkin. Di gelek çavdêriyan de xuya dibe ku parastina zarokan ya ji erdhejê û piştgirîyên sosyal-hestî gelekî bisînor in. Hema bibêjin hemû zarok li cihekê wisa mezin dibin ku derfetên kêf û sosyalbûnê tune ne. Li bajarên mîna Dîlok û Meletîyê zarokan gotîye, ji ber hilweşîna bajar, ew dixwazin li cihekê din bişînin û ev yek nîşana nerehetîyeka psîkolojîk e. “Daxwaza jîyana li cihekê din ya ji ber talûkeya bajarî”, bandora psîkolojîk ya terikandina cihûwarê xwe nîşan dide. Pîspor, dibêjin îhtîmal e ku daxwaza guhertina mekan, ji ber daxwaza revê pêk tê; zarok heta ku li wan mekanan dimînin, tiştinan (avahîyên hilweşîyayî, erdhejên bi dû ra hwd) dibînin ku trawmayê tînin bîra wan.

Ji alîyekî ve jî, xurtbûna pêwendîyên nava malbatê wekî mekanîzmaya heqjêderketinê hatîye raçavkirin. Li Xetayê malbatên ku hevdiştin bi wan ra hatine kirin, gotine ku zarok bêhtir bi wan ve hatine girêdan. Zarokên biçûk -yên ku nû dest bi dibistanê kirinê di nav da- wê endîşeyê dijîn ku “dêûbavên wan bi wan ve negihîjin”. Loma gotine ku mana bi mezinan ra û malbatên qelebalix ewlehîyeka zêdetir dide wan. Ev gotin daneya %93,5 ya ku dibêje, em li cem malbatê ewletir his dîkin, bimana dîkin. Zarok ne di dewlet yan jî derdorê da lê di malbatê da li ewlehîyê digerin. Ewlehîyê nava malbatê xurt be jî, dîyar e ku bawerîya van zarokan ya bi dinyayê hejîyaye. Ev jî di demeka dirêj da, dikare pîrsgirêkên mîna danîna pêwendîyên sosyal û beşdarîya civakî derxîne.

Mînaka ku Giringîya Pêdivîya Piştgirîya Psîkososyal Nîşan Dide: Li Meletîyê hin malbatan gotîye ku zarokên wan hîn jî ditirsin û gelek pêvajoyên trawmatîk hîn nebihurîne. Hatîye raçavkirin ku gelek zarokan qet tedawîya psîkolojîk nestandîye û hîn jî bandorên erdhejê dihewînin. Ev mînakeka baş e ji bo rêjeya %10,6 ya ku dibêje min piştgirîya psîkolojîk standîye. Her wekî her ji 9 zarokan 8 zarok di halê xwe da mabe. Tê gotin ku, ev zarok ne tenê ji piştgirîya manewî lê ji ya madî jî bêpar mane. Yanî zarokên ku bê mal, malbat û aborî ne; li benda desteka madî û psîkolojîk in. Li Meletîyê jî ji ber tunebûna cihên rehetbûnê û kêfê, zarok dixwazin ku her wekî yên Dîlokê li cihekê din bijîn. Ev çavdêrî, nîşan didin ku pêvajoya başbûna psîkososyal kêm maye û hesta ewlehîya bingeîn ya zarokan ji nû ve nehatîye avakirin.

Alîyê Îhlalên Mafan: Gava mirov bi perspektîfa îhlalên mafan li bandorên psîkososyal û kêmanîya piştgirîyan binêre, valahîyên mezin di “mafê gihîştina her zarokî ya standardên bilindtirîn yên tenduristîyê” (made 24) û “mafê rehabîlîtasyon û jînûveentegrasyona sosyal” (made 39) da xuya dibin. Herweha mafê perwerdehî û (made 28) û lîstîkê (made 31) jî bandorê ji kêmanîya desteka psîkosoyal digire: zarokekê ku piştî trawmayê destek nestandibe dikare li dibistanê hûr nebe, nexwaze bilîze yan jî pirsgerêkên tevgerî bijî. Di çavdêrîyan da jî dixuye ku hin zarok difikirin ku dev ji dibistanê berdin û wê bimana nabînin. Ev encameka trawma û endîşeya dahatîyê ye û eger midahaleyek psîkososyal nebe zarok dikare ji mafê perwerdehîyê bêpar bimîne.

Bi kurtî, bi zelalî dixuye ku li herêmê zarok pirsgerêkên mezin yên psîkolojîk dijîn û ji bo van pirsgerêkan piştgirîyê nastînin. Di daneyan da cudahîya herî mezin di navbera pêdivîyên psîkosoyal û piştgirîyê da ye: %89 zarokên ku ditirsin, %10 zarokên ku destekê distînin. Ev tê manaya ku mafê zarokan yê “parastin û başbûnê” tên îhlalkirin. Di beşa encam û pêşnîyazên raporê da ev mesele bi vî awayî hatîye binavkirin: “divê xizmeta piştgirîya psîkosoyal ya bibandor û berberav ji bo zarok û dêûbavan bê dabînkirin, fealîyet werin plankirin da ku tesîrên psîkosoyal, ruhî û laşî bînin tedawîkirin.

Piştgirîya psîkososyal bi tenê nayê manaya xizmeta terapîyê, çalakîyên sosyal û çandî yên ku zarokan normalîze bikin jî di vê çarçoveyê da ne. Loma, di raporê da pêşnîyazên wekî qadên ji bo fealîyetên çand û sporê, mihîrcanên birêkûpêk, çalakîyên sînema û şanoyê cih digirin. Ev çalakî hem mafê lîstik û kêfê bi cih tînin hem zarokan rehabîlîte dikin.

Di encamê da, dane û çavdêrî nîşan didin ku trawma û streseka mezin heye lê piştgirî gelekî kêr e. Ev rewş ji bo tenduristîya ruhî û adaptasyona civakî ya zarokan ya dûdirêj xetere ye. Eger pêşîya wê neyê girtin, ev zarok dikarin salên pêşîya me pirsigrêkên psîkolojîk, têkçûna perwerdehîyê û zehmetîya integrasyona civakî bijîn. Di çarçoveya vê analîzê da, mecbûrî ye ku mekanîzamayên piştgirîya psîkososyal yekser werin xurtkirin.

Analîza Mafên Perwerdehî, Lîstik û Beşdarîyê

Erdhejê perwerdehîya zarokan qut kir, herweha derfeta lîstinê û beşdarîya çalakîyên sosyal bi rêjeyeka mezin ji wan stand. Li gor Madeya 28. ya Peymana Mafên Zarokan mafê zarokan yê perwerdehîyê, li gor ya 31ê mafê bêhnvedan, lîstin û beşdarîyê heye. Di krîzên weha da parastîna van mafan, ji bo mezinbûna zarokan ya normal heyatî ye. Di vê beşê da rewşa perwerdehîya zarokan, pêwendîya wê ya bi xebatê ra (karkerîya zarokan), gihîştina wan ya lîstik û demên vala û derfetên wan yên beşdarîya biryarên di derbarê jîyana wan da tên analîzkirin.

Domandina Perwerdehîyê û Terka Dibistanê: %95,8ê zarokan gotîye ku ew dibistanê didomînin. Ev nîşaneka erênî ye. Lewra piştî bobelatên mezin, îhtimal heye ku perwerdehî demeka dirêj bisekine û terka dibistanê peyda bibe, lêbelê di nava 2 salan da hema bibêjin temamê zarokan li perwerdehîyê vegeŕiyane. Lê xuya ye ku %4,2yê zarokan li derveyê pergala perwerdehîyê mane. Ev rêje tê manaya bi sedan xwendekar. Li vir pirs van zarokan çima dibistan nedomandine giring e. Di xebatê da bi awayekê dîrekt bersiva vê pirsê tune be jî hin nîşanek hene.

Nîşanekek, meseleya karkerîya zarokan e. Xebatê pirsîye, “hûn niha dixebitin?; %5,9ê zarokan goîye erê. Ev tê manaya ji 17 zarokan yekî. %94ê zarokan goîye ez naxebitim ku divê weha be; lewra piranîya beşdarên hîn xwendekar in. Li vir tiştê krîtîk, rewşa perwerdehîya kesên ku dibêjin em dixebitin. Li gor datayan %10,1ê zarokên ku mezûn yan jî xwendekarên lîseyê ne gotine em dixebitin; di dibistana navîn da ev rêje %0,7, di ya seretayî da %0 e. Yanî hema bibêjin temamê kesên ku dixebitin 15-18 salî ne. Dibe ku hin ji van xwendekaran dev ji dibistanê berdabin yan jî hem dixwînin hem dixebitin.

Mihtemel e ku %4,2yê ku ji pîrsa “hûn perwerdehîyê didomîn? ra goîye na û %5,9ê ku ji pîrsa “hûn dixebitin?” ra gotine erê heman kes bin. Rîskeka tê zanîn e ku piştî bobelatên mîna erdhejê hin zarokên kamil ji bo destekê bidin debara malê yan jî debara xwe bikin dev ji dibistanê berdin û dixebitin. Di vê xebatê da jî xuya bûye ku ji 3 paran 2 parên zarokên ku gotine em dixebitin, îfade kirine ku ew berî erdhejê nedixebitîn. Zarok ji bo pîrsa “Hûn berî erdhejê dixebitîn?” bi rêjeya %61,3 gotine “na”. bi tenê %38,7ê wan berî erdhejê dixebitîn. Ev agahîyeka giring e: erdhejê karkerîya zarokan zêde kirîye. Ev yek di raporê da weha hatîye şirovekirin: “pêvajoya piştî erdhejê zarok mecburî xebatê hiştine”. Van zarokan, mihtemel e ku, ji dibistanê feraxat kirine (ya bi tûmî yan jî carinan) û dest bi xebatê kirine.

Karkerîya Zarokan û Qutbûna ji Perwerdehîyê: Daneyên di derbarê cik û karên ku zarok dikin, rewşa îhlalkirina mafê perwerdehîyê zelal dike. Ji bo pîrsa “Erê be hûn kîjan karî dikin?” %45,2yê zarokên dixebitin goîye berdestk, %29an karker, %19,4an garson, %3,2yan terzî, %3,2yan jî goîye cotkar. Ev kar bêhtir keda laşî dixwazin û karên bêwesf yan jî nîv-wesfî ne. Dibe ku bersivên berdestk û karker nîşana xebata li sektorên mîna senayî, kargehan, înzêat yan jî çandinîyê be. Ev kar ji sibehê heta êvarê bin nahêlin ku zarok biçin dibistanê, eger part-time bin jî dê bandoreka neyînî li perwerdehîya zarokan bikin. Di çavdêriyên Dîlokê da xuya bûye ku hin kurikan xwastine ku li şûna dibistanê di karên mîna tamîra cereyanê da bixebitin û “ji ber şertên jîyanê bi armanca alîkarîya malbatan” dixwazin bixebitin. Ev gotin dike ku em motîvasyona li paş karkerîya zarokan fam bikin: alîkarîya aborîya malbatê û endîşeya debarê.

Di lêkolînê da pirs “Hûn çima dixebitin?” ji zarokan hatiye pirsîn. Bersivan zehmetiyên aborî derxistine pêş: %54,8ên zarokên ku dixebitin gotine “ji bo alîkarîya malbatê”. %22,6an gotîye “tercîha min e” lê mirov dikare bi rewşa malbatê ve girê bide. %12,9ên wan gotîye “ji ber ku mezin bûme”, %6,5ê wan gotîye “ji ber zîyana aborî ya piştî erdhejê”, %3,2yan jî bersiv nedaye. Li vir, zarokên ku “ji ber zîyana aborî ya piştî erdhejê” hilbijartine balkêş in; lewra dibêjin ku piştî bobelatê mecbûr mane ku bixebitin. Lêbelê ji %54,8ên ku gotine “alîkarîya malbata xwe”, di esilê xwe da ji ber xizanîya malbata xwe ya piştî erdhejê mecbûr mane ku bixebitin. Ango piranîya zarokan ji ber rewşa xerab ya aborîya malbatê dev ji mafê perwerdehîyê berdane û dest bi kar kirine. Ev rewş bi madeya 32yan ya Peymana Mafên Zarokan ya NYyê ra rasterast pêwendîdar e. Herweha îndîrekt îhlala madeya 28an (mafê perwerdehîyê) e, ji ber ku karkerîya zarokan, wan ji dibistanê qut dike.

Zarokên ku Perwerdehî Domandine: Ji bo %95,8ê ku dibistan domandine jî zehmetî hene. Wekî mînak, zarokên ku ji ber erdhejê ji dibistanê mane di hînbûnê da li paş mane. Çavdêrîyên Meraşê dîyar dikin ku herçiqas dêûbav difikirin ku rewşa perwerdehîyê hinekî baş bûye jî, bi ya wan ne zêde dûrî rewşa berî erdhejê ye. Heta hin mamosteyan gotîye ku cudahî di navbera berî û piştî erdhejê da tune ye. Ev gotin, îma dikin ku perwerdehîyê dest pê kiribe jî ev nayê manaya ku kalîteya wê baş bûye. Jixwe berî erdhejê jî li herêmê pîrsgirêk hebûn (terka dibistanê, kêmanîya kalîteyê); lê wek hawê erdhejê ev pîrsgirêk meznitir kirine û hewldanên telafîkirinê encameka gelekî baş nedane. Dîsa jî em dikarin bibêjin ku zarokên ku diçin dibistanê qet nebe di ewlehîyê da ne, mijûl dibin û rûtînên wan qismî bin jî vedigerin. Ev ji alîyê psîkosoyal jî faktoreka giring e. Ioma, armanceka krîtîk e ku mirov zaroka li dibistanê vegerîne. Di beşa pêşnîyazan da wisa hatiye gotin: “Ji bo zarokên ku perwerdehîya wan nîvî maye divê proje bîn çêkirin û ji bo yê ku nikarin xwe bigihîjin perwerdehîyê piştgirîyên sosyal û aborî bîn dabînkirin. Ev bersiveka rastarast ya ji bo pîrsgirêka karkerîya zarokan û terka dibistanê ye: eger mirov desteka aborî nede malbatan û derfeta perwerdehîyê ya telafî nede zarokan, ev zarok dê her ji mafê perwerdehîyê bêpar bimînin.

Lîstik û Wexta Vala: Zarokî ne bi tenê serdema perwerdehiyê lê ya lîstin, bêhnvedan û beşdarîya çalakîyên sosyal e. Li herêma erdhejê mafê lîstik û kêfê gelekî kêr bûye. Anket dîyar dîkin ku ji derveyê malê, gelekî kêr cih hene ku zarok bikarin lê bilîzin. Ji bo pîrsa “Hûn dikarin bilîzin?” %69,2yê zarokan gotîye erê. Ango nêzî %30ê wan nalîzin. Ji bo pîrsa “Cihek heye ku hûn bikarin lê bilîzin?” %60,8ê zarokan gotîye erê. Ango %39,2yê wan ne xwedîyê qadekê ne ku bilîzin. Ev cih dikare nava malê, park, hewç, kuçe û hwd. be. Ji ber ku bi erdhejê ra cihên ewle kêr bûn, mihtemelen derfeta lîstina li park û hewşan pir kêr e. Di çavdêriya Xetayê da xuya bûye ku, zarok ji ber ku park tune ne wekî cihê ewle kuçe û hewş bi lêv kirine. Yanî park tune ne, loma ji mecbûrî li kuçeyan û nêzî kavilan dilîzin. Ev yek jî dike ku dêûbav diltirsî bibin û zarok bitirsî bilîzin.

Tiştê ku bêîmkaniya lîstikan hinekî telfî dike, ji bo hin zarokan kêfa dijîtal e. Anketê di derbarê bikaranîna amûrên dijîtal/teknolojîk da jî data dane hev. Xuya ye ku piraniya beşdarên anketê digihîjin amûrên mîna telefon, tablet û kompîteran; bi tenê %5an gotine ku ev amûr tune ne yan jî wan bi kar naynin. Xuya dibe ku zarokên din cîhazê dijîtal ji bo armancên cûrbicûr bi kar tînin: Hin zarok dibêjin ku em ji bo dersê, lîstikê, muzîkê, kêfê û hwd. bi kar tînin (%22,9), %2,9ê wan dibêje ku ew bi tenê ji bo guhdarîkirina muzîkê bi kar tînin. Di vê kontekstê da, em dikarin bibêjin ku amûrên dijîtal ji bo wan hem amûrên kêfê hem yê perwerdehiyê ne. Dema mirov li hewce-darîya perwerdehiya ji dûr ve û pêwendîya online difikire, gihîştina van amûran vediguhere mafekî. Li vê derê divê em cudahiya zayendê ji bîr nekin. Nexasim li derdorên mihafizekar, gihîştina keçikan ya ji bo amûrên dijîtal dikare were astengkirin. Ji ber vê yekê pêşniyaza raporê ev e: “di serî da keçik divê hemû zarok bigihîjin amûrên dijîtal yê wekî telefon, tablet û kompîteran”. Di nava %5ê ku xwe nagihîjin amûran beşa giring ji keçikan pêk tê. Ev jî jê hêla mafê zan-yarî û ragihanê tê manaya neheqîyê.

Qada Ewle û Beşdarî: Hisa ewlehîyê ya zaroakan ya di lîstikan da li kuçe û dibistanan bi mafên wan yê beşdarîyê û beşdarîya wan ya jîyana civakî ra eleqedar e. Dane, nîşan didin ku rêjeya hisa ewlehîya li kuçeyê %38,7 e. Di lîstikan da hisa ewlehîyê %61,8 e. Ev tê wê manayê ku beşeka mezin ya zarokan li derve xwe di ewlehîyê da his nake. Di vê rewşê da, zarok dê kêm tir derkevin bilîzin, werzişê bikin û beşdarî çalakîyên civakî bibin. Mirov dikare bibêje ku malbat jî zarokên xwe bi diltirsî dişînin derve. Jixwe malbat jî endîşeya ewlehîyê bi lêv dîkin; di çavdêriyê Meraşê da xuya dibe ku dêûbav jî endîşeya ewlehîyê his dîkin. Di vê rewşê da, mafê beşdarîya zarokî, (di manaya beşdarîya biryarên di derheqê wî da û beşdarîya jîyana sosyal da) kêm dimîne. Wekî mînak, zarokek li kuçeyê ewle his neke, ew dê beşdarî çalakîyên taxa xwe nebe û neçe aktîvîteyên derveyê dibistanê.

Alîyekê din yê mafê beşdarîyê, xweîfadekirina zarokan û beşdarîya pêvajoyên dana biryaran e (ÇHS made 12 û 13). Anketê di vê mijarê da, lêhaybûna zarokan ya di derbarê mafên wan û gihîştina mafan da pîvaye û bi rengekê îndîrekt li ser beşdarîyê nîşanek pêşkêş kirine. Daneyên ber destan têra xwe balkêş in: beşeka giring ya zarokan, dizanin ku mafên ji wan ra tên rêzkirin “mafên zarokan” in. Bo nimûne %84,9 mafê strînê, %87,8 mafê perwerdehiyê, %87,4 mafê tenduristîyê rast pênase kirine. Yên ku gotine mafê lîstin û kêfê %87,6, yê mafê azadîya derbirînê %86,9, yê mafê parastina ji tundîyê %87,3, yê ku gotine parastina li dijî kedxwarîyê %85,6 derketine. Rêjeyên herî kêrmafê lîstikê %70,9 û mafê lîstikê %70,9 taybet ya ji ber seqetîyê (%79,8) derketine. Ev encam nîşan didin ku ihtimal heye ku piştî erdhejê di warê mafan da agahdarî hatibe kirin. Jixwe ji çavdêriyan jî ev yek tê famkirin. Ev lêhaybûn, ji bo ku zarok bikarin halê xwe li ser bingeha mafan biparêzin biqîmet e.

Lê li herê mîkanîzamayên beşdarîya zarokan hîn geş nebûne. Di pêşnîyaza raporê ya 14. da di vî warî da weha hatîye gotin, “divê ew mekanîzma ava bibin û bîn kontrolkirin ku dabîn bikin ku zarok di hemû mijarên bi wan ra eleqedar da beşdarîyeka aktif bikin”. Aniha ev anket bixwe jî dibe ku bibe platformek ku zarok dengên xwe bidin bihîstin. Giring e ku li Meletîyê mirovan gotîye “heta niha xebateka weha nehatîye meşandin”. Ev nîşan dide ku xebatên bi vî rengî kê m in. Ji ber vê yekê, mafê beşdarîyê ne bi tenê bi dibistan û malbatê ra eleqedar e; bi giştî di birêvebirina afetan û plansazîya civakê da jî beşdarîya zarokan di hundirîne. Di pêvajoya erdhejê da nêrînên zarokan, beyanên pêdivîyan gelek caran li paş mane. Tiştên ku herî zêde hewceyîya wan pê heye (lîstik, desteka psîkososyal hwd.) gelek caran li paş maye. Kêmanîya mafê beşdarîyê, wê rîskê di hundirîne ku îhlalên qadên din jî xuya nebin. Wekî mînak, eger zarok pirs-girêkekê bilêv neke, ew pirs-girêk (çî li dibistanê çî li kampê) dikare dewam bike.

Bi vê beşê, dîyar dibe ku li herêma erdhejê zarokan mafê xwe yê perwerdehîyê bi rêjeyeka mezin bi dest xistine lê ji ber karkerîya zarokan qîsmek heye ku ev maf ji bo wan di rîskê da ye. Vegera van kesan bi destekên aborî û sosyal mimkin e. Mafê lîstin û kêfê hîn jî bi rêjeyeka bilind tê îhlalkirin; cihên ewle yên lîstinê tune ne, derfetên çalakîyan kê m in û ew rewş bandoreka nebaş li xweşî û başîya ruhîyeta wan dike. Di warê beşdarî û mafên derbirînê da zarok xwedîyê agahîyên teorîk in lê di pratîkê û qirarana da ne xwedî gotin in. Ev bi nehesibandina pêdivîyên zarokan ra jî pêwendîdar e. Daneyên raporê nîşan didin ku, divê di gel perwerdehîyê zarok bibin xwedîyê mafên lîstinê û jîyana sosyal da ku ew vegerin “tecribeyên zarokîyeka normal”. Ji bo vê jî hewce ye ku cih û çalakîyên ku dostên zarokan in û ya herî giring mekanîzmayên guh didin dengê zarokan bîn sazkin.

Em bi perspektîfa mafan binêrin, di warê mafê perwerdehîyê da (made 28) gavên erênî hatine avêtin, lê divê ji bo zarokên bi sedemên aborî ji vî mafî bêpar dimînin, pêşgirîyên taybet (PMZ made 4) bên standin. Mafê lîstinê (made 31) hema bibêjin bi tûmî hatîye bînpêkirin, divê ji bo dabînkirina vî mafî bînesazîya fîzîkî (park, qadên sporê) û bername (şahî, kargeh) bên plankirin. Mafê beşdarîyê (made 12) bi beşdarîya başbûna jîyana zarokan bixwe ra eleqedar e ku meclîsên zarokan yan jî dezgehên bi vî rengî dikarin bibin bersiva vê pêdivîyê. Pêşnîyaza raporê ya ku dibêje “divê ji bo zarokan mîhrîcan, sînema, şano û fealîyetên sporê bên plankirin”, di esilê xwe da hem ji bo mafê lîstin/kêfê hem ji bo mafê beşdarîyê ye.

Ji bo beşdarîya nava malbat û dibistanê têbînîyek: hatîye raçavkirin ku zarokan gava li cem dêûbavên xwe bersiva pirsên anketan dane, bi dizîka li dêûbavên xwe nêrîne. Ev nîşan dide ku zarok bi azadî nêrînen xwe nabêjin û li erêkirina digerin. Dibe ku ev ji ber hewldana dêûbavan ya ji bo parastina zarokan ya piştî erdhejê be. Ji bo dabînkirina tam ya mafê beşdarîyê, divê zarok bikarin di nava malbatê da û di asta civakê da fîkrên xwe bi azadî bibêjin.

Bi giştî, di derbarê mafê perwerdehî, lîstin û beşdarîyê da tabloyeka tevlihev heye. Di perwerdehîyê da hejmar ber bi başîyê ve diçin lê hin pîrsgirêk û neheqî didomin. Mafê lîstinê bi rêjeyeka mezin hatîye paşguhkirin. Û zarok hema bibêjin qet beşdarî pêvajoyên bîryardanê nabin. Di van xalan da rewş baştir nebe, nîfşê ku piştî erdhejê mezin dibe dê di geşedanê da arîşeyên mayînde bijî. Loma, di beşa pêşnîyazan da em li van mijaran hûr dibin.

Cudakarî, Ziman Mafên Çandî

Erdhejê, bandor li hemû zarokan kir, lê ji bo hin zarokên dezavantaj û cudakarîyên zêdetir xuya bûn. Nexasim zarokên penaber/koçber, yê ji ziman û etnîyên cuda tên û keçik ji ber nasnameya xwe xwedîyê wê potansîyelê ne ku li cudakarîyê rast werin. Peymana Mafên Zarokan ya NYyê, dibêje ku divê zarok bê cudakari xwedîyê mafan bin. Di vê beşê da em dê bala xwe bidin tecrîbeyên cudakarîyê, daneyên li ser bikaranîna zimanê dayikê û mafên çandî.

Çeşiddariya Etnîk-Zimanî ya Herêmê: Wîlayetên ku xebat lê hatîye meşandin wekî mozaîka ziman, nasname û bawerîyê ye. Li Xetayê elewîyên ereb li Dîlokê kurd û hwd hene. Lê herweha li van wîlayetan destûr tune ye ku ev nasname zêde bixuyin. Ev tesbît nîşan dide ku ev kom nikarin mafên xwe yê çandî bi kar bînin. Ev rewş berî erdhejê jî hebû, lê piştî wê zêdetir bû. Ji ber ku di têkoşîna saxmanê da mafên çandî hatin piştguhkirin.

Bikaranîn û Lêhaybûna Zimanê Dayikê: Pêşî pirsar “Zimanê we yê dayikê çi ye?” ji zarokan hatîye kirin. Encamên vê pirsê ji ber têgihîştina wan ya zimanê wan yê dayikê encamên balkêş dane. %66,5an gotîye tirkî; %24,2yan gotîye kurmancî, %6,9’an jî gotîye erebî. %1,5ên wan gotîye, ez nizanim, %1ê wan gotîye naxwazim bibersivînim. Ev hejmar çeşiddariya zimanî ya herêmê nîşan dide. Li vir tiştê balkêş ew e ku hin zarok li malê bi zimanekê cuda biaxivin jî, ew dibêjin zimanê me yê dayikê tirkî ye. Lêkolîneran raçav kirine ku beşeka giring ya zarokan li şûna zimanê ku li malê û kuçeyê diaxivin, pêdivîyê dibînin “zimanê fermî” bi bersivî bibêjin. Heta mînakêka tîpîk e ku zarokê zimanê wî yekê din e bibeje ku “zimanê min yê dayikê tirkî ye”. Ev yek nîşan dide ku zarok ji ber asîmîlasyon û fişara civakî ditirsin ku zimanê xwe yê dayikê bibêjin. Dibe ku zarok bifikire ku ez bibêjim “zimanê min yê dayikê kurdî ye” ew dê bi mirovan xweş neyê û vê têgehê baş fam nake. Zarokî, bi bandora polîtîkayên nasnameyê û pergala perwerdehîyê, ne wisa be ji dikarin bibêjin “zimanê min yê dayikê tirkî ye û ez welatîyekê tirkî im”. Li vir pêwîst e ku em bibêjin: Mafê her zarokî ye ku çand û zimanê xwe bi azadî îfade bike (PMZ made 30), mafê zarokên endamên gelên kêmar û niştecih yê jîyîna çandî)

Pirsar “Malbata we bi piranî bi kîjan zimanî diaxive?”, ji bo destekkirina pirsar zimanê dayikê hatîye pirsîn. %83,9ê zarokan gotîye tirkî, %14,7 gotîye Kurmancî, %1ê gotîye erebî. Li vir cudahî di navbera pirsar zimanê dayikê heye: yê dibêjin zimanê min yê dayikê kurmacî ye %24,2 ye, lê yê li malê bi kurmancî diaxivin %14,7 e. Ev cudahî dikare ji ber tirs yan jî têgihîştina cuda be. Dibe ku hin zarok, li malê bi kurmancî biaxivin jî, gotibin “em bi piranî bi tirkî diaxivin”.

Yan jî dibe ku tirkî bi rastî jî li malê bêhitir tê axiftin, malbatên bi kurdî dizanin jî bi tirkî bi zarokên xwe ra diaxivin (encameka asîmîlasyonê). Çawa be, em dikarin bibêjin ku nêzî %15ê zarokan li malê bi tirkî naaxivin. Ev rêje li Xetayê zêdetir, li Dîlokê kemtir e.

Di Pêvajoya Erdhejê da Cudakarîya li Ser Esasê Zimanî: Lêkolînê li vê cudakîrîyê jî pirsîye. Ji bo pirsê “Di pêvajoya erdhejê da yan jî piştî wê, ji ber zimanê xwe yê dayikê, hûn li cudakarîyê rast hatin?” piranîyê gotîye “na” (%85,7). %5,7an gotîye erê, %3,2yan gotîye “bêbiryar im”, %2,7an jî “qismen” (hinekan jî gotîye nabersivînim. Ev, nîşan dide ku cudakarîyeka bi vî rengî zêde nehatîye raporkirin. Lêbelê li vir divê em hay ji du xalan hebin:

1. **Têgihîştin û beyana zarokan:** Dibe ku zarok bi cudakarîyê nehisin û nikaribin bi cudakarî pênase bikin. Wekî mînak, gava xwe negihîne xizmetekê, dibe ku nizanibe ku ev ji ber zimanî ye yan jî nexwaze ku bibêje.

2. **Reva ji bersivê:** Gava em li rewşa temen û zayendê ya bersivan dinêrin, xuya dibe ku kurik û zarokên biçûk bêhtir dibêjin “bersiv tune” yan jî “bêbiryar im”: kurik %5,2, keçik %1,7 nebersivandine. Ji yê 7-10 salî %6,7 bersiv nedane (yên ji 15 salî mezintir %2). Ev, dibe ku nîşan dide ku yê biçûk û belkî yê baş bi zimanî nizanin di bersivê da ditengijin. Herweha beşek heye ku dibêje “qismen”. Yê dibêjin “erê” kêmtir in, lê em nikarin piştî xwe bidin van daneyan û bibêjin “cudakarîya zimanî tune ye”. Me gotibû ku zarokên koçber û penaberan meyl dîkin ku van pirsan nebersivînin. Bo nimûne ji bo pirsê “Di alîkarîya erdhejê da hûn ji ber koçberîyê li cudakarîyê rast hatin?”, zarokên biyanî %65,6an bersiv nedaye, %12,5an gotîye erê û %21,9an gotîye na. Ev nîşan dide ku zarok bi diltirsî bersiva pirsên hesas didin.

Axirê, piranîya bersivan gotîye pirsgrêk tune ye, lê dibe ku ev rewş ji ber ku zarok rewşa xwe nabêjin, pêk tê. Dîsa jî mimkin e ku zarok li cudakarîyeka cidî rast nehatibin. Wisa dixuya ku hin kêmanî hebin jî, bi awayekê aşkera cudakarîyeka etnîk-zimanî nehatîye kirin.

Astenga Zimanî ya di Gihîştina Xizmetan da: Nîşaneyeka bêhtir berçav ev pirs e: “Xizmet çêbûn ku ji ber zimanê xwe yê dayikê we sûd jê wernegirt?”. %89,9ê zarokan gotîye na. Bi tenê %10,1ê wan gotîye erê. Ji van kesan %42,3yan gotîye “em bi zimanê dayikê xizmetê nastînin” (yanî di dezgehên fermî da, bi zimanê me bi me mihatab nabin). %38,5an gotîye “em bi rehetî naaxivin” (mihtemelen ji ber diltirsîyê û lihevnekirinê), %15,4an gotîye “alîkarî nedan”, %3,8an gotîye “bi zimanê me perwerdehî nedan”. Ev, nîşan dide ku zarokên ji ber zimanî xizmetê nastînin. Para mezin “em bi zimanê dayikê xizmetê nastînin”, mihtemelen rewşên wekî tunebûna xebatkarên bi kurdî dizanin yê li nexweşxaneyê yan jî di çalakîyên desteka psîkosoyal da tunebûna pisporên bi erebî dizanin. “Em bi rehetî naaxivin” jî girîng e: mihtemelen ji ber ku bi tirkî baş nizanin diltirsî dibin yan jî derdê xwe nikarin baş bibêjin. Îfadeya “alîkarî nedan” dibe ku rastarast nîşana cudakarîyê be. %3,8ên ku gotîye “bi zimanê me perwerdehî nedan” daxwazekê nîşan dide ku li herêma ji zû da tê nîqaşkirin; lê ji ber ku li Tirkîyeyê mafê zimanê dayikê tune ye (zimanê perwerdehîyê tirkî ye), ev zarok berî erdhejê jî ji vî mafî bêpar bûn.

Zarokên Koçber û Penaber: Zarokên koçber û penaber yê xebatê. (li dor %6an in) pirsên li ser cudakarîyê bêbersiv hiştine. Her ji 8 zarokan yekî di belavkirina alîkarîyê da cudakarî his kirîye, lê ji ber ku %65,6 bêdeng mane, mirov dikare bibêje ku ev rêje bilindtir e.

Di çaçoveya van agahîyan da, di konteksta mafê ziman û çandî da du encam derdikevin: Yek, di xizmet û alîkarîyên erdhejê da cudakarîyeka aşkera û berbelav ya li ser esasê ziman û etnîyê nehatîye ragihandin. Ango alîkarî bi piranî li gor pêdivîyan hatine belavkirin, li nav zarokan hisa ku ew “kêm tene dîtin” çênebûye. Du, hin pirsgrîkên strîktuel û têgihîştinî didomin: desteka zimanê dayikê nadin zimanê kêmaran, di xizmetan da pîrzimanî kêma e, zarokên diltirsî dibin ku nasnameya xwe aşkera bikin. Divê mirov nexasim hay ji zarokên penaberan yê biteredut hebe. Divê, ne bi tenê mirov miameleyeka dadmend bike, herweha bike ku her kes xwe wekhev his bike.

Ji hêla zayendê ve, dane nîşan didin ku cudakarîyeka berçav xuya nabe lê bandorên rolên zayenda civakî tîrî hiskirin. Pêşnîyaza li ser gihîştina keçikan ya amûrên dijîtal li ser lêhaybûna di vî warî da ava bûye. Divê mirov li pêdivîyên taybet yê keçikan (pedên hîjyenîk, pêdivîya tiwalet û serşokên cuda, endîşeya ewlehîyê hwd.) miqate be. Di pêşnîyazan da behsa gihîştina amûrên dijîtal, ewlehî û beşdarîyê ya ji bo keçikan hatîye kirin.

Nirxandina li Esasê Mafan: Li go PMZ ya NYyê made 2. pêwîst e ku tu zarok ji ber ziman, netewe, zayend û hwd. nebe mexdûrê cudakarîyê. Di alîkarî û avakirina piştî erdhejê da ev prensîb esas e. Dane nîşan didin ku piranîya zarokan difikirin ku miameleyeka wekwek li wan hatîye kirin. Lêbelê hewceyîya destekkirina mafê bikaranîna zimanê xwe (made 30) û jiyîna çanda zarokan kêmaran hîn didome. Bo nimûne di desteka trawmayê da bi zimanê zarokî bê axiftin û çalakîyên sosyal û perwerdehîyê da pirzimanî hikum bike, zarok dê baştir fam bikin û xwe hêjatir his bikin. Di derheqê zarokên penaber da, parastina wan zarokan (PMZ made 22) berpîrsîyeka taybet ya dewletê heye. Ji bo ku ev zarok xwe aid his bikin û tîrsa cudakarîyê neji bermane bîr çêkin ku ew entereyî gelê herêmê bibin.

Bi kurtî, li herêma erdhejê ji îhlalên mafan yê li ser esasê ziman, dîn, etnî yan jî zayendê yê aşkera bêhtir; kêmanîyên mafan yê veşarî û strîktuel hene. Eger mirov bersivê nede çêşîdarîya heyî, mafên hin koman tîrî astengkirin. Pêşnîyaza raporê ango “xebatên lêhaybûnê yê di derbarê îhmal, îstismar, mahremîyet û mafên zarokan da” dikare di çarçoveya pêşîlêgritina cudakarî û belavbûna mafên zarokan da bê nirxandin. Dîsa pêşnîyaza “avakirina pergaleka bişopîne ku mafên zarokan bê cudakarî tîrî îcrakirin”, dê bûyerên cudakarîyê tesbît bike û midahîleyê li wan bike.

Entegrasyona Çavdêrîyên Anketoran û Şiroveyên Çawanî

Yek ji alîyên dewlemend yê vê lêkolînê ew e ku, di gel daneyên çendanî çavdêrîyên çawanî jî hatine berhevkirin. Em dê di vê beşê da, daneyên çendanî yên beşên berê, bi mînakên taybet bi kurtî bidin û pêwendîya wan ya bi encamên çendanî ra deynin. Bi vî şêklî, hin paternên derbirîn û tevgerên zarokan dê baştir bînin famkirin.

1. Meyla “qîma xwe pê anînê” û îfadeyên erênî: Yek ji têgehên balkêş yê raporê “Qîma xwe pê anîn” e. Bala anketoran kişandîye ku, zarok ji bo derfet û mafên xwe bi piranî bersivên erênî didin û dibêjin “heye, em baş in, pirsgerê tune ye”. Lê gava dor tê daneyên hejmarî em dibînin ku di esilê xwe da ev derfet gelekî bîşnor in. Wekî mînak, %86ê zarokan dibêjin em digihîjin pêdivîyên xurekî û kincan lê em dizanin ku %8ê wan nagihîjin. Dîsa, %93yê wan gotîye “mafê me yê strînê heye” lê em dizanin ku %63yê wan fîlî digihîjin mafê strînê. %87ê wan dibêje mafê me yê lîstinê heye lê hew %61ê wan dibêjin em dikarin bilîzin. Ev cudahî nîşan dide ku zarok rewşa heyî dipejirînin û meyla wan ya bi halê xwe dilxweş bin heye. Anketoran ragihandîye ku zarok gava li cem dêûbavên xwe bin yan jî li cihekê fermî bin “gazinan nakin”. Heta hin zarokan gava bersiv dane bi dizîka li dêûbavê xwe nêrîne. Ev nîşan dide ku zarok bi zanebûn yan jî na, hewl didin ku pirsgerêkên xwe biçûktir nîşan bidin. Dibe ku qîma xwe bi tiştekî anîn, mekanîzmayeka heqjêderketinê be: li şûna behsa tiştê tune bike, li tiştê heyî hûr dibe û wî mezin dike. Bo nimûne, zarokekê bajarê konteynirê dikare bibêje, “park tune ye lê ez dikarim li kuçeyê bilîzim”. Ev meyl, dibe ku sedema hin rêjeyên erênî yên encamên anketê be.

Li vir çavdêrî tiştekî hînî me dikin: hin pêdivî hene ku zarok bi lêv nakin. Em bi tenê li hejmaran binêrin em dê bibêjin ku %93yê zarokan ewle his dikin (di nava malbatê da), lê ev rastîya ku li kuçeyê xwe ewle his nakin hinekî vedişêre. Qîma xwe pê anîn wekî perdeyekê ye ku dengê zarokan asteng dike. Loma çavdêrîyên çawanî krîtîk in. Bo nimûne zarokên bajarê konteynirê yê Semsûrê dibe ku gotibin di warê pêdivîyan da “em baş in” lê anketo têbînî nivîsîye û gotîye ku gelek kes mihtacê xurek û kincan in.

2. Bertekên Psîkolojîk yê Cuda li Gor Temenan: Me di daneyên çendanî da dît ku yê temen-biçûk dibêjin ku gelek bandor li min bû lê ji yê kamil hinan gotîye qet bandor li min nebû. Sedema vê di çavdêrîyên çawanî da xuya dibe. Hatîye raporkirin ku li Dîlokê zarokên 7-8 salî di her dengî da vediciniqin. Di gel vê, yê ji 15 salî mezintir dibêjin “em aniha natirsin” lê derdê wan tiştekê din e: ew dibêjin “şertên jîyanê gelekî dijwar in, em dê li vî welatî çî bikin?” û endîşeya xwe bi lêv dikin. Ango bandora trawmayê bi yê kamil ra jî heye lê yê wan ne tirsê erdhejê lê ya dahatîyê ye. Yê kamil bi bersivan nîşan dane ku ew reşbîn in û derbirînên mîna “xwendin bêmana ye, dîtina kar zehmet e” delîla wê ne. Ev têkelbûnê baş ya çavdêrîyên çawanî û çendanî ye. Hejmar dibêjin ku yê kamil kêmtir ditirsin lê çavdêrî nîşan didin ku ew di nava bêçaretî û reşbînîyê da ne. Daxwaza xebatê ya zarokên ji 15 salî mezintir encama vê endîşeyê ye. Daneyên li hev nakin (bo nimûnê %15 kurik gotîye “qet bandor nekir” lê li kar digere) bi vî awayî bimana dibin.

Cudahîya di navbera temenan da di mekanîzmaya derbirînê da jî dixuye. Zarokên biçûk trawmayê rasterast bi girî û tirsê nîşan didin lê kamil bi helwesteka dîssosîyatîf hewl didin ku xwe “gihîştî û xurt” nîşan bidin. Di çavdêrîyên Dîlokê da gava gotine, “zarokên binîya 15 salî trawma derbas nekirinê lê yê mezintir derbas kirine û êdî natirsin”, û vê jî lê zêde dikin, di binî ra diltirsîyek heye. Ev fenomen di trawmayê da tê zanîn. Kamil û mezin carinan bi înkare tirsê vedîşêrin. Têbînîyên çavdêran dihêle ku em vê înkare tam bibînin.

3. Erêkirina Malbatê û Azadîya Derbirînê: Di anketan da hebûna dêûbavan bandor li bersivan kirîye. Anketo dibêjin ku, zarok bi piranî naxwazin dêûbavên xwe xemgîn bikin yan jî dixwazin ku ew bersivên wan erê bikin. Ev rewş, nîşan dide ku, dibe ku zarok di hin mijarên hesas da fikrên xwe yê rastîn negotibin. Nexasim mijarên wekî îstismar û îhmalê (di anketê da rastarast nehatibe pirsîn jî) dikare ji ber vê yekê dernekevin holê. Ev çavdêrî nîşan dide ku mafê azadîya derbirînê li malê çiqasî dikare bê astengkirin. Dibe ku dêûbav piştî erdhejê xwastibin zarokên xwe bêhtir biparêzin û zarok jî ji bo ku wan diltirsî nekin aciziyên xwe bi lêv nekiribin. Daneyên çendanî yê gelekî erênî dikarin bi vê bandorê bîr ravekirin. Ji ber ku zarok li cem dêûbavê xwe ewle his bike ev tê manaya “dêûbavê min li min miqate ne, ez naxwazim wan xemgîn bikim”. Ev rewş jî hêla mafê beşdarîyê giring e. Şert û mercên guncaw lazim in da ku zarok bi azadî biaxivin. Ev pêşnîyaza raporê loma krîtîk e: “divê mekanîzamyên wisa bîr avakirin ku zarok beşdarî pêvajoyên biryardanê bibin”; lewra bi van mekanîzmayan zarok dikarin dûrî bandora dêûbavan biaxivin û dengê xwe bidin bîhîstin.

4. Hişmendîya ji bo Pêdivî û Daxwazên Zarokan: Çavdêrîyên anketoaran, daxwazên zarokan jî nîşan didin. Wekî mînak, dibêjin ku li Semsûrê zarok çalakîyên kêfê yê mîna sînema û şanoyê dixwazin; herweha kargehên lîstîk, resim û perwerdehiyê dixwazin lê ev kargeh bi berdewamî tune ne. Ev agahîyên çawanî, encama kêma ya “gihîştina mafê lîstinê kêma e” ya daneyên çendanî destek dîkin; herweha nîşan didin ku zarok daxwaza pêşnîyazên reel dîkin. Bi vî awayî mafê beşdarîyê tê bikaranîn. Van daxwazan rengê xwe daye pêşnîyazên polîtîkayê yê raporê jî (pêşnîyaza “divê qadên ji bo çalakîyên spor û hunerê bîr dabînkirin û çalakîyên birêk pêk bîr lîdarxistin xwe dispêre van çavdêrîyan. Herweha zarokên Dîlok û Meletîyê dibêjin ku “em dixwazin li cihekê din bîjin” û ev nîşan dide ku ew bi derdora xwe çiqasî neewle ne. %38,7ê zarokan gotîye ku em li kuçeyê ewle his dîkin, di çavdêrîyan da dibêjin ku “ev bajar bitalûke ye, em dixwazin ji vir herin”. Ev, arezûya zarokan ya çûna ji wê derdorê nîşan dide. Ev arezû, bêguman hertim nikare pêk were; lê li vir tiştê giring, zanîna hestên zarokan e.

Ev hest kêmbûna ewlehî û aîdîyeta ji bo derdorê ye. Loma di pêşnîyazan de ev hevok hene: “Divê ji bo zarokan şertên derdorê yên ewle û wan destek dîkin bîn avakirin; kuçe, park, qadên kesk li gor ewlehî û geşedana zarokan werin dîzaynkirin”. Ev bersiva têgihîştina “ev der ne ewle ye” ya zarokan e.

5. Bêhêvîti û Endîşeya Dahatîyê: Di têbînîyên çavdêriyan da yek ji cihên herî balkêş, ew têbînî ye ku ji bo Dîlokê hatîye nivîsîn. Hevoka zarokên di ser 15 salî ra “di derbarê dahatîyê da ne xwedîyê tu hêvîyan in”, cihê herî reşbîn û rast yê raporê ye. Ev ciwan difikirin ku “ew dê jîyana xwe çawa îdame bikin”, dipirsin ku ew dikarin li vî welatî çî bikin. Dibêjin em hînî erdhejê bûn lê tîrsa wan ya esil tenêti û nepenîya piştî erdhejê ye. Em bi saya çavdêriyên çawanî vî tiştî dizanin. Bo nimûna di anletê da pîrseka wekî “hêvîya we ji dahatîyê heye?” tune bû. Encama vêya bi awayekê îndîrekt di daneya karkerîya zarokan û motîvasyona perwerdehîyê da xuya bû: ciwanên ku ndixwazin dev ji dibistanê berdin û %12,9 zarokên ku gotine “ez mezin bûm, divê bixebitim” olana vê bêhêvîtiyê ne. Bêhêvîtiya ji bo welatî û dahatîyê ne bi tenê pîrsgirêka herêma erdhejê lê ya temamê welatî ye; lê bobelatê ev hest xurttir kirîye. Çareya vê, ne bi tenê alîkarîya madî ye; divê mirov bikare hêvîyê bide wan û programan ava bike ku ew di avakirina jinûve ya civakê da roleka aktîf bilîzin. Li vir, mafê beşdarîyê giring e: ciwan bizanin ku mirov li wan guhdarî dîkin, bizanin ku di avakirinê da manaya gotina wan heye, ew dê hesta armancekê bi wan ra çêbibe. Pêşnîyaza dawî di vê derbarê da ye: “Divê mekanîzamayên wisa bîn avakirin ku zarok di derheqê wan mijaran da ku bi wan ra eleqedar in bikarin bi awayekê aktîf beşdarî pêvajoyên biryardanê bibin”. Bi vî awayî tenêti û bêçaretîya wan dikare kêm bibe. Herweha bi saya “divê ji bo zarokan fealîyetên spor û hunerê, mîhrîcan û hwd. bîn plankirin”, dê alî ciwanan bike ku ew normalîze bibin, derfetên sosyalbûnê bibînin û ji rewşeka depresîf xelas bibin.

6. **Çavdêrîyên li Ser Keçikan:** Di têbînîyên çavdêrîyan da di derbarê zayendê da daneyeka berçav xuya nabe lê di hin îfadeyan da di navbera keçik û kurikan da cudahî tên hiskirin. Bo nimûne, li Meraşê gotine “ev rewş bêhtir di kurikan da dixuye” û hatîye dîyarkirin ku ew difikirin ku dibistan bêmana ye û dixwazin di karekî da bixebitin. Ev tîne bîra mirov ku keçik ewçend naxwazin ji dibistanê veqetin. Herweha di şertên herêmê da mihtemel e ku zarokên dixebitin bêhtir kurik bin. Dibe ku keçik bi karên nava malê yên wekî lênêrîna xwişk û birayên biçûk, suxreyên malê û konî zêde mijûl bûbin. Herweha, pêşnîyaza ji bo Xetayê ya ku dibêje “Divê di serî da keçik hemû zarok bikarin xwe bigihîjînni telefon, tablet û amûrên bi vî rengî”, xwe dispêra çavdêrîyên meydanê: keçik, belkî ji ber ku bêhtir tên parastin, kêmtir digihîjin amûrên teknolojîk. Di konteksta çandî da, dibe ku malbatan bikaranîna telefonê ya keçikên xwe bisînor kiribin.

Di encamê da, em daneyên çawanî û çendanî bi hev ra bixwînin, resmekê bêhtir hevgirtî derdikeve pêşberî me. Hin tiştên bi hejmaran nedihatî famkirin bi saya hûrgilî û têbînîyên çavdêrîyan xuya bûn. Halê psîkolojîk yê zarokan, tevgerên wan, awirên wan, pêwendîya wan ya bi mezinên wan ra kûrahî daye şirovekirina daneyan. Bo nimûne, daneya “Tu bandor %11an nehatîye” bi tena serê dibêje ku qet bandor li hin zarokan nehatîye lêbelê çavdêrîyan, kêmanîya vê îfadeyê derxistîye holê.

Ev entegrasyon vî tiştî tîne bîra mirov: li paş her îstatîstîkê çîrokeka zarokan heye. Çavdêrî vê çîrokê heta cihekî nîşan dide. Bi gotineka din, gava daneyên çawanî resimê makro xêz dike, çavdêrîyên çawanî bi mînakên mîkro wî resimî boyax dike.

Analîzên heta vê derê, nîşan dane ku pêdivî û îhlalên mafên zarokan bi hev ve girêdayî ne. zarokê ku pîrsgirêka stargehê dijî ewle his nake; ewle his neke bi lîstikan nalîze; ku nelîze stresa xwe navêje û ji hêla psîkolojîk ve xerab dibe; ji ber ku xera dibe, nikare li dibistanê hûr bibe û wê bêmana dibîne; zarokê ku dev ji dibistanê berdide neçar dimîne ku bixebite; gava dixebite bêhtir îhlalên mafan rûbirû dimîne....

Ev zincîr, giringîya hişmendîya parastin û destekkirina zarokan ya hevgirtî nîşan dide. Entegrasyona daneyên çawanî û çendanî, xelekên vê zincîrê tîne ba hev û alîkar dibe ku em resimê mezin zelaltir bibînin.

Nîqaşa Giştî

Agahîyên ku lêkolîna meydanî dide, di derbarê zarokên herêma erdhejê da tabloyeka berfireh pêşkêş dike. Bi giştî, di gel ku du sal di ser erdhejê ra derbas bûne, di gelek hêlên mafên zarokan da hem başbûn hem îhmal di nava hev da ne. Em dikarin sernavên heta vir, bînin ba hev û van tesbît û xalên nîqaşê yên giştî rêz bikin.

- **Asta îcrakirina mafan:** mafên ku di Peymana Mafên Zarokan ya NYYê da bi giştî hatine rêzkerin (mafên jîyîn, geşbûn, parastin, beşdarîyê û hwd.), li hêrêmê di astên cuda da qut bûne. Di çarçoveya mafên jîyîn û geşbûnê da pêdivîyên bingeîn (stargeh, xwarin, tenduristî) bi tûmî nehatine dabînkirin; di çarçoveya mafê parastinê da destêka psîkososyal, ewlehî û parastina ji karkerîyê kêr maye; di mafên beşdarî û azadîyê da zarokan gotina xwe têra xwe nekirîye; qadên lîstin û azadîya derbirînê teng bûne. Di gel vê yekê, di hin qadên mîna mafê perwerdehîyê da bilez başbûn pêk hatîye, piranîya zarokan dîsa vegeîryane dibistanê. Ango tablo bi temamî ne reşbîn e; lê di her qada mafan da xelekên lawaz hene.

- **Nîşaneyên ku Baştir û Xerabtir Dibin:** Hin nîşaneyên ku -di gel bendewarîya berevajî- baş derketine, balê dikişînin: bo nimûne %95ê zarokan li dibistanê vegeîryane. Ev ûnsireka îstiqrarê ye. Ji alîyekî ve, hin qad ji texmînan xerabtir in: kêmanîya desteka psîkolojîk û zêdebûna karkerîya zarokan ya piştî erdhejê alarmên cidî ne. Herweha kêmanîya çalakîyên sosyal û lîstikan jîyana rojane ya zarokan bêreng û bistres dike. Ev nîşaneyên negatîf, wan qadan nîşan didin ku divê çavkanîyeka mezintir jê ra bê veqetandin.

-Îhlalên mafan yê bi hev ra pêwendîdar: Agahî bi tena serê xwe jî sedema endîşeyê ne, herweha xuya ye ku di nava çerxeka wisa da ne ku bandoreka neyînî li hev dikan. Bo nimûne kêmanîya strargehan û desttengîyê kirîye ku zarok bixebitin; karkerîya zarokan gef li mafê perwerdehîyê xwarîye; bêperwerdehî û trawmayê kirine ku zarok bêhêvî li dahatîyê binêrin; bêhêvîtiyê pirs-girêkên psîkolojîk kûrtir kirîne hwd. Divê ev zincîr bişikê. Yan na bandorên van trawmayan dê bi salan bidomin. Zarokekê îro 16 salî dev ji dibistanê berdaye û xebitîye, dê sibehê tev li çerxa xizanîyê bibe û zarokên wî jî dê di rîskê da bin. Herweha nedana desteka psîkosoyal, dikare rê li ber Nexweşîya Stresa Piştî Trawmayê, depresyon û anksîyeteyê veke.

-Daneyên hevnegirtî û nedihatî texmînkirin: Di xebatê da em li çend encamên hevnegirtî rast hatin. Bo nimûne, haya zarokan ji mafan heye lê asta gihîştina wan kême. Ev cudahiya di navbera lêhaybûna mafan û îcrakirina mafan da nîşan dide. Ev cudahî, di zarokan da bi wextê ra dibe sedema hêvîşikestinê: zarokê ku bi mafê xwe dizane lê nikare bi kar bîne dikare nema bi sîstemê ewle be. Hevnegirtineka din: kurik dibêjin bandora psîkolojîk li me nebûye lê bêhêvî ne. Ev di esilê xwe da kêmanîya derbirînê ye. Agahîyeka din ya nehevgirtî ew e ku keçik xwe bêhtir ewle his dikan (di pirsên cudakarîyê da rêjeya keçikên ku gotine “na min cudakarî nedît” zêdetir e, di pirs-girêkên ewlehîyê da di nava malbatê da belkî keçik bixwe amintir in). Belkî ji ber ku malbat keçikan bêhtir diparêzin ev encam derketibe. Nuansên bi vî şeklî, şiroveyeka kûr ya daneyan dixwaze.

- **Paternên Temen û Zayendê:** Me di analîzê da dît ku, faktora temen di gelek cihan da cudahîyê derdixe holê. Bandora erdhejê rastarast li zarokên biçûk dibe lê kamil bandorên sosyal û îndîrekt dijîn. Biçûk bêhtir bi malbatê ra tên girêdan, kamil meyla qutbûna ji malbatê (xebat, koç) nîşan didin. Ev rewş, nîşan dide ku divê alîkarî û bername li gor temen bîn sazîkin. Wekî mînak, ji 7-10 salîyan terapîya lîstinê, gotina çîrokan, adaptasyona rûtîna dibistanê hwd. hewce ne; ji bo 15-18 salîyan şewirdarîya karîyerê, perwerdehîya pîşeyî, platformên beşdarîyê hewce ne. Herweha normên civakî dikarin qada tevgera keçikan teng bike û berpirsîyên giran bide ser milê kurikan. Loma, ji bo keçik û kurikan rîskên cuda hene û divê li gor van polîtîka bîn avakîrin. Wekî mînak, ji bo ku keçik ji dibistanê qut nebin divê bernameyên destekê yê taybet (bûrs, veguhastîna ewle hwd.) çalak bin; ji bo ku kurik zû berê xwe nedin xebatê desteka aborî û perwerdehîya pîşeyî bîn plankîrin.

-**Rewşa Zarokên Penaber û Kêmar:** Îhtimal e ku daneyan rewşa zarokên penaber û kêmar rast nîşan nedabin, lewra ev zarok şermok in. Lêbelê çavdêr û hin bersiv îma dikin ku rîskên taybet ji bo van zarokan hene. Nexasim dîtirsîya cudakarîyê ya zarokên ji Sûrî, rewşa wan ya hesas hin xerabtir dike. Divê ev zarok hem ji alîkarîyên giştî bi wekhevî sûdê wergîrin hem pêdivîyên wan yê wekî desteka zimanî û adaptasyonê bîn dabînkîrin. Hemû zarokên herêmê mexdûrên erdhejê ne lê ji bo zarokên ku bi kurdî û erebî diaxivin pîrsgirêka zimanê dayikê streseka mezintir bi xwe ra tîne. Loma, ji bo ku tu zarok jê kêr nemîne (prensîba “Leave No One Behind”) divê ji bo zarokên koçber û kêmar polîtîkayên berfireh bîn meşandin.

- **Berpîrsîyên Dewletê û Kêmanîya Polîtîkayan:** Alîyê herî giring yê nîqaşa giştî ew e ku, ev dane di asta sîstemê da çi nîşan didin. Tirkîye alîgirê Peymana Mafên Zarokan ya NYyê ye û di her şertî da teahud kirîye ku ew dê mafên zarokan biparêze. Rewşên awarte yên wekî afetan, ne rewşên luks in ku mirov bikare mafên zarokan piştguh bike; berevajî wê, ew dem in ku zarok herî zêde mihtacên parastinê ne. Piştî erdhejên 2023yan, kêmanîya qanûneka ji bo parastina zarokan derketîye holê. Yanî di mevzûatê da valahî heye; wekî mînak di mijarên mîna tehlîyeya zarokan, gihandina malbatan, şopandina zarokên winda, berdewamîya mafên perwerdehî û strînê da protokolên zelal tune ne. Ev kêmanî dibe ku di îcrakirinê da jî helwestên ne tekûz derxistibin holê. Desteka psîkosoyal maye ji înnîsyatîfa DCSyan ra; qadên lîstîkê bi derfetên komên dilxwaz pêk hatine; perwerdehî hinekî ber bi hev ve hatîye lê mijarên mîna karkerîya zarokan hatine piştguhkirin. Ev dane nîşan didin ku ji bo afetan mekanîzmeyên mayînde ji bo parastina zarokan hewce ne. Pêşnîyazeka raporê: avakirina sîstemeka şopandin û raporkirineka bilez e ku mîdahîyê îhlalên mafan bike. Sîstemeka weha, di dahatîyê da dikare di krîzan da rewşa zarokan gavbigav bişopîne û çareserîyan pêşnîyaz bike; herweha dikare wekî ombudsmanekî bixebite ku di demên normal da îhlalên mafên zarokan bişopîne.

- **Çareserîyên li ser esasê civakê bi beşdarîya zarokan:** Alîyekê din yê nîqaşê ew e ku, divê çareserî ne ji destekî tenê were lê li ser bingeha civakê pêk were. Dane, nexasim di warê ewlehî û başîya psîkosoyal da, giringîya cîranî û torên sosyal nîşan didin (zarok di malbata fireh da yan jî li taxê bêhtir hest bi başîyê dike, pêdivîyê bi lîstina bi hev ra dibîne). Loma, qadên ji bo zarokan û çalakîyên bi komî dê hem ji bo zarokan hem ji bo malbatan başîyê bi xwe ra bînin. Beşdarîya zarokan jî divê di navenda çareserîyê da be. Zarok bixwe herî baş dikarin pirsgirêk û pêdivîyên xwe bibêjin. Agahîyên vê raporê jî ji dengê zarokan tê. Di erdhejê da cara yekem me guh da zarokan. Divê ev tişt bidome. Divê mirov, rêveberîyên herêmî, dibistan, navendên zarokan û meclîsên zarokan veke û nexasim di plansazîya piştî afetê da fikirên zarokan bistînin. Wekî mînak, eger park dê çêbibe yan jî ewlehîya dibistanê dê bê zêdekirin divê li zarokan bê guhdarîkirin.

Hem agahîyên hêvîyê didin hene hem yê ku nadin hene, lê piştî du salan mirov dikare bibêje ku pêdivî bi plansazîyeka acîl ya li ser bingeha mafan heye. Encamên raporê nîşan didin ku zarok ji bo geşedanê amade ne (vegera dibistanê, fêrbûna mafan, tevkarî); herweha eger bêhmalkirin gelek tişt dê ji dest wan biçin (qutbûna ji perwerdehîyê, trawmaya kronîk, çerxa feqîrîyê).

Li vir divê madeya sêyem ya Peymana Mafên Zaroka bê bîra mirov. Di her biryar û tevgerê da divê mirov guh bide fêdeya zarok. Divê di avakirina piştî erdhejê da ev prensîb bibe rêber. Fêdeya zarok pêdivîyên fîzîkî, hestî, pewerdehî û sosyal dihundirîne.

Herweha madeya 6., ango mafê jîyan û geşedanê dîyar dike ku zarok ne hew divê sax bimîne herweha divê bigihîje potansîyela xwe. Di vê kontekstê da, nayê qebûlkirin ku zarok piştî du salan, hîn di konteynirê da be û piştgirîya psîkolojîk nestîne. Mafê geşedanê bi başbûna bi tûmî mimkin e.

Di encamê da, nirxandina giştî vêya nîşan dide: rewşa mafên zarokan ya herêma erdhejê, qadên giring yê başbûnê dihundirîne. Divê ev geşedan biberdewamî be û qadên ku hatine îhmalkirin bilez bê destekirin. Berî afeteka din, berpirsîyeka însanî û qanûnî ye ku mirov birînên vî nifşî derman bike. Yan na, ev zarok mezin bibin jî dê ji mafên xwe mehrûm bimînin û newekhevîya civakî kûrtir bibe.

Encam û Pêşnîyazên Polîtîkayên li Ser Esaasê Mafan

Encam: Ev xebata meydanî nîşan dide ku, ji perspektîfa mafên zarokan, pirsgerêkên cîdî hene ku divê bên çareserkin. Zarok hem hilweşîna fîzîkî ya erdhejê hem trawmaya hestî dijîn. Di warê pêdivîyên bingeîn yê wekî stargeh û xwarinê da pêşketin hene lê di mijarên başîya psîkosoyal, ewlehî û beşdarîyê da valahîyên mezin hene. Rêjeya vegera dibistanê zêde ye lê tengasîya ekonomîk û trawma mafê perwerdehîyê dixê xetereyê. Mafê lîstin û bêhnvedanê hatîye jibîrkin, zarok zaroktîya xwe naîn. Dîsa jî, asta hişmendîya zarokan ya ji bo mafên wan û ruhê tevkarîyê, nîşan didin ku bi gavên rast guherîn mimkin e. Li vir asas ew e ku mirov hişmendîyeka giştî ya li ser bingeha mafan hem pêdivîyên zarokan dabîn bike hem geşedana dîdirêj destek bike. Divê prensîbên bingeîn yê Peymana Mafên Zarokan (rênedana cudakarîyê, fêdeya bilind ya zarokan, mafê jîyîn û geşedanê, mafê beşdarîyê) bibe rêber. Rêlibergirtina îhlalên mafên zarokan ne bi tenê meseleya alîkarîya însanî ye, di çarçoveya peymanên navneteweyî da ku Tirkîye alîgirê wan e, meseleyeka edaletê ye ku divê pêk were.

Li jêr, di çarçoveya encamên xebatê da pêşnîyazên polîtîkayên li ser esasê mafan, hatine rêzkirin. Ev pêşnîyaz dikarin rêberîya hemû pardaran bikin ku ji bo parastin û geşkirina mafên zarokan dixebitin (dezgehên dewletê, rêveberên herêmê, dezgehên civaka sîvîl, dezgehên navneteweyî û seranserê civakê).

Hişmendîya Mafan û Perwerdehî: Divê asta lêhaybûna mafên zarokan bê zêdekirin. Divê bi perwerdehî û kargehan zarok mafên xwe bêhtir fêr bibin. Divê zarok fam bikin ku mafên wan di jîyana rojane da beramberî çî tî (bo nimûne mafê lîstinê ne bi tenê têgehek e, tê manaya ku mirov xwedîyê qada lîstinê be). Li dibistanan divê mifredata mafên zarokan bê xurtkirin, mamoste û welî di vî warî da bên perwerdekirin.

Xizmetên Desteka Psîkososyal: Divê ji bo zarok û malbatan piştgirîya psîkosoyal ya bibandor û berbelav bê dabînkirin. Divê ji bo dermankirina bandorên psîkolojîk, hestî û laşî yê erdhejê hin fealîyetên demdirêj bîn plankirin. Li her derê ekîbên desteka psîkosoyal yê mobîl werin wezîfe-darkirin. Divê bi terapîya lîstîkê, hunerê û komî alîkarîya zarokan bê kirin ku ji trawmayê xelas bibin. Divê her kesê mihtac (bê cudakarî) bêpere û bi rehetî bigihîje van xizmetan.

Şopandin, Raporkirin û Koordînasyon: Divê pergalek bê avakirin ku îcraya mafên zarokan bişopîne û bilez midahîle bike. Navendeka Şopandina Krîzên Mafên Zarokan dikare bê avakirin ku di krîzan da bixebite û di navbera dezgehan da koordînasyonê dabîn bike. Ev navend, divê îhlalan berhev bike, bigihîjîne dezgehên eleqedar û qonaxa çareserîyê bişopîne. Wekî mînak, li bajarê konteynirê îstismarek peyda bibe, ev mekanîzma dê dezgehên eleqedar agahdar bike û bi hev ra tevbigere. Di demên normal da jî bixebite û nîşaneyên mafên zarokan (dewama dibistanê, rewşa tenduristîyê, weqayên şidetê hwd.) birêkûpêk rapor bike û yê ku polîtîkayan saz dikin agahdar bike.

StargehêN Ewle û Derdora Tendurist: Divê her zarok bikare bigihîje strîna ewle, hîjyen, xwarin û ava paqij. Nexasim jî bo zarokên di konteynir û konan da divê xebat bîn meşandin. Divê ewle-hîya stargehan (li dijî şewat, sûc, şertên xerab) bê zêdekirin; binesazîya jî bo ava paqij bêkêmanî bê avakirin. Divê stargehin bîn çêkirin ku zarok zivistanê necemidin û havîne nebin mexdûrê germê. Wekî din jî, bi projeyên xanîyên mayînde divê malbat yekser li malên xwe vegerin. Mafê stargehê, bingeha mafên din yê zarokan e; zarokekê ku maleka wî ya ewle tune ye ne mimkin e ku bi tenduristî mezin bibe.

Gihîştina Perwerdehîyê û Berdewamî: Ji bo zarokên ku perwerdehîya xwe nîvî hiştine divê program bên amadekirin. Divê zarokên ku erdhejê bandor li wan kirîye bên tesbîtkirin û destekeka teybet ji bo wan bê dabînkirin. Divê ev destek hêsankirina qeydîya dibistanê, derfeta perwerdehîya bi veguhastin, alîkarîya kirtasîye û formayên dibistanê û dersên telafîyê bihundirîne. Nexasim ji bo zarokên ku ji ber pîrsgirêkên aborî nikarin biçin dibistanê alîkarîyên sosyal û ekonomîk bên dabînkirin (wekî bûrsan û alîkarîya sosyal ya ji bo malbatê). Wekî din jî, Wezareta Perwerdehîya Neteweyî divê navendên şêwirdarîya psîkolojîk û rêberîyê xurt bike û adaptasyona zarokên trawmatîk bişopîne.

Pîştgirîya Pêşveçûnî û Xizmetên Tenduristîyê: Divê kêmanîyên laşî, ruhî û hişî yên zarokan bên tesbîtkirin û dermankirin. Serdema piştî erdhejê, dibe ku kiribe ku kontrolên tenduristî û şopandîna pêşveçûna zarokan kêma bimînin. Loma, divê li herêmê kontrolên berfireh bên kirin, kêmanîya xurekan û derzîyan, paşvemana mezinbûnê, astengîyên hînbûnê bên dîyarkirin û midahîle li wan bê kirin. Bo nimûne, zarokên ku nema baş dibihîsin yan jî ji ber trawmayê baş nikarin bi axivîn dikarin tev li bernameyên rehabilitasyonê bibin.

Gihîştina Dîjîtal û Perwerdehî: Di serî da keçik, divê hemû zarok bikarin bigihîjin telefon, tablet, kompîter û înternetê. Divê bên perwerdekirin da ku van amûran bi berdarî bi kar bînin. Îhtimal e ku di pandemî û erdhejan de mirov derbasî perwerdehîya ji dûr bibe; loma divê cudahîyeka dîjîtal tune be. Divê malbat bên perwerdekirin da ku keçik ji cîhana dîjîtal mehrûm nemînin; hewce bike divê mirov bi cudakarîyeka pozîtîf tevbigere. Divê bi kargehên xwendin û nivîsîna dîjîtal, zarok bi çavkanîyên online bên nasîn da ku hem kêfê bikin hem fêr bibin. Ev parçeyekê mafê gihîştina zanyarîyê û mafê derbirîna azad e (PMZ, made 13, 17)

Têkoşîna bi Karkerîya Zarokan: Divê karên ku zarok tê de dixebitin bên tesbîtkirin û cihên ku wan dixebitînin baş bên kontrolkirin. Divê dezgeh hevkarîyê bikin ku rê li ber vê karkerîyê bigirin ku piştî erdhejê zêde bûye. Armanca nîhaî divê ew be ku tu zarok neçar nemîne ku bixebite. Divê dezgeh desteka sosyal (pere, firsendên îstihdamê) bidin malbatan, navendên perwerdehîya pîşeyî bibin cihên cazib û zarok hem perwerdehîya berdestkîyê bistînin hem dibistanê bidomînin. Karkerîya zarokan hem mafê perwerrdehîyê hem tenduristîyê tehdîd dike, loma divê plansazîyeka taybet ji bo wê bê amadekirin.

Lêhaybûna îhmal û îstismarê: Divê xebatên lêhaybûnê bi mijarên îhmal, îstismar, parastina ji tundîyê û mahremîyetê ji bo zarok û mezinan bên meşandin. Şertên piştî afetan mixabin ji bo zarokan rewşên wisa ne ku ew dikarin li îhmal û îstismarê rast werin. Loma, divê hem zarok laşên xwe û sînorên xwe fêr bibin hem mezin (dêûbav, dilxwaz, mamoste) prensîbên parastina zarokan hîn bibin. Divê li dibistan û navendên civakî zarok bên fêrkirin “gotina na”, “axaftina bi mezinê ewle” çî ye; mezin jî bên perwerdekirin ku dêûbavîya pozîtîf ya serdemên trawmayê û birêvebirina stresê çî ne. Wekî din jî, divê mirov pêhisîna rewşên birîsk û rêyên xwastina alîkarîyê bi zarokan bide famkirin. Bo nimûne, li her herêma konteyniran, mirov dikare “wezîfedarekê ewle” dîyar bike û wî bi zarokan bide nasîn; da ku zarok bikare serî lê bide. Ev xebat ji bo mafê zarokan yê parastina ji tundî û kedxwarîyê (PMZ, made 19, 34) elzem in.

Derdorên ewle û dostê zarokan: Divê ji bo zarokan şertên derdorê yên ewle û destek dikin bên avakirin. Divê kuçe, park, qadên lîstinê ji bo zarokan ewle bin û li gor geşbûna wan bin. Divê parkên xerabe ji nû ve bên avakirin û li bajarên kanteyniran qadên lîstinê yên ewle bên çêkirin. Divê li derdora qadên lîstikan pêşgirîyên trafîkê (sînorê lezê, barîyer) bên standin. Divê ronîkirin, paqijkirin û serrastkirina kuçeyan li gor zarokan bên dîzaynkirin. Divê li her taxê navendeka civînê ya ewle bê avakirin da ku zarok lê hev bibînin û beşdarî çalakîyan bibin. Ev navend dikarin wekî cihên piştgirîya psîkososyal û şewirînê jî bên biakaranîn. Derdora ewle bi tenê nayê manaya talûkeyên fîzîkî tune ne, herweha hebûna derdoreka wisa ye ku zarok bi azadî bilîzin û sosyal bibin.

Çalakîyên Sporê, Hunerî û Çandî: Divê ji bo zarokan qadên li gor çalakîyên spor û hunerê bên dabînkirin; çalakîyên birêkûpêk yên wekî mîhrîcan, şano, konser û maçên sporê bên plankirin. Zarokên herêma erdhejê demeka dirêj bi tenê li saxmanê hûr bûne û ji çalakîyên bikêf bêpar mane. Lêbelê lîstik û kêf ji bo başbûn û normalbûna ruhî krîtîk in. Bi hevkarîya rêvebirîyên herêmî û Dezgehên Civak Sîvîl şahîyên zarokan dikarin bên lidarxistin; sînema û şanoyên gerok bên sazkarin; tûrnûvayên sporê bên çêkarin. Divê beşdarîya van çalakîyan heta bikare bênavber û berbelav be. Bo nimûne her dawîya hefteyê li taxeka cuda ji bo zarokan kargeh û nîşandana fîlman dikarin werin lidarxistin. Hewldanên wisa, dê bikin ku madeya 31. ya PMZyê angoma mafên bêhnvedan, bikaranîna wextên vala û beşdarîya jîyana çandî dabîn bikin.

Ewlehîya Zarokan û Agahdarkirin: Divê xebatên lêhaybûnê bên kirin da ku zarok jî alîyê fîzîkî û hestî ve xwe ewle his bikin û bikarin xwe biparêzin. Bizanin ku di afeteka nû da ew dê çi bikin û amadekarîya rewşên acîl dê jê hêla psîkolojîk ve wan rehet bike. Divê li dibistan û taxan zarok bên agahdarkirin ku ew dê di erdhejê da û piştî wê çawa tevbigerin. Herweha, divê zarok bizanin ku ew dikarin bi çi xetereyan ra rûbirû werin (kesên nîyetxerab, qadên bitalûke hwd.) û hewce bike dikarin alîkarîyê bixwazin. Di vê çarçoveyê da mamosteyên rêber yên dibistanan û pisporên xizmetên sosyal dikarin bi zarokan ra xebatên komî bikin. Ewlehî ne tenê parastina ji gefên derveyî ye, divê zarok bi xwe bawer be. Zarok çiqasî agahdar be, di rewşên dijwar da ewçend kêrpanîkê dike û dikare li mafê xwe bigere.

Mekanîzmayên Beşdarîya Zarokan: Divê mekanîzmayên wisa bîn avakirin û xebitandin ku zarok di mijarên di derheqê wan da bikarin aktîf beşdarî biryaran bibin. Ev wekî banê hemû pêşnîyazan e. Lewra başbûnên mayînde yê qadên din bi beşdarîya zarokan mimkin e. Li şaredarîyan meclîsên zarokan dikarin bîn avakirin, li wîlayetê komîteyên mafên zarokan bîn avakirin. Li van platforman bi taybetî divê zarokên mexdûrê erdhejê bîn temsîlkirin di warê stargeh, perwerdehî û plansazîya bajarî da bikarin nêrînên xwe bibêjin. Bo nimûne, di plankirina dibistanekê da mirov dikare bi nûnerên xwendekaran ra îstîşareyê bike. Yan ciwan dikarin rasterast beşdarî bernameyên desteka psîkososyal bibin (dikarin bibêjin ku çi cure çalakî dixwazin). Ji bo ku mekanîzmayên beşdarîyê bi ser bikevin, divê mezin qîmetê bidin nêrînên zarokan û di biryaran da hesabê wan bikin. Bi saya vê zarok dê his bikin ku ew parçeyekê civakê yê çalak in û bi xwe bawer bin. Hesta “Li me guhdarî dikin, fikra me giring e” piştî erdhejeka ku bawerîya mirov hildiweşîne dê bike ku zarok dîsa bi civakê ra bîn girêdan.

Pêşnîyazên jor, di çarçoveya encamên raporê da hatine nivîsîn û gavên wisa ne ku hev temam dikin. Bo nimûne gava piştgirîya psîkososyal, mafê lîstinê û mekanîzmayên beşdarîyê bi hev ra bîn nirxandin, başbûn û xurtbûna hisî ya zarokan dê mimkin be. Herweha, eger pêşnîyazên perwerdehî û desteka aborî bi hev ra werin îcrakirin, têkoşîna bi karekerîya zarokan ra bi ser bikeve.

Gotina dawî ew e ku, ji bo fêdeyeka mezin ya zarokên herêma erdhejê, divê hemû failên eleqedar yekser dest bi tevgerê bikin. Rastîyên vê raporê, piştrast dikin ku jînûveavakirineka li ser esasê mafên zarokan hewce ye. Zarok endamên herî hesas lê herweha herî zêde hêviyê didin yê civakê ne. Parastina mafên wan, ne hew parastina dahatîya wan ya şexsî lê parastina dahatîya welatî ye. Gava mirov birînên afetê derman dike, li zarokan hûr bibe, ev yek dê bibe mifteya avakirina civakeka xurt û dadmend. Di vê çarçoveya da, îcrakirina pêşniyazên jor, dê bibe telafîya zaroktîya jidestçûyî ya bi hezaran zarokên herêma erdhejê û îcrakirineka rastîn ya Peymana Mafên Zarokan ya li meydanê. Ev jî berpirsiya me tevan e.

